

**Zimanê Dayikê û  
Bikaranîna  
Wî Wek Hêmeya  
Bingehîn a  
Çandê**



# ÇAVDÊRIYA MAFÊN ZIMANÎ Û ÇANDÎ

Zimanê Dayikê û Bikaranîna Wî Wek  
Hêmeya Bingehîn a Çandê

Omer FÎDAN

Amed, Avrêl - Gulan 2020

**ÇAVDÊRIYA MAFÊN  
ZIMANÎ Û ÇANDÎ**

Zimanê Dayikê û Bikaranîna Wî Wek  
Hêmeya Bingehîn a Çandê

Amed, Avrêl - Gulan 2020

**Nivîskar:**

Omer Fîdan

**Edîtor:**

Ulaş Güldiken

**Mîjanpaj:**

Zafer Tüzün

**Tora Ziman û Çanda Kurdî**

Diclekent Mah. Selahattin Eyyubi Bul. Altın-4 Sitesi C Blok Altı No:53/E  
Kayapınar - Diyarbakır

Web: [www.torakurdi.org](http://www.torakurdi.org)

E-mail: [info@torakurdi.org](mailto:info@torakurdi.org)

Tel: 0549 660 22 21



Ev weşan di çarçoveya Bernameya YE Etkiniz de, bi piştevaniya Yekîtiya Ewropayê pêk hatiye. Ji naveroka vê weşanê tenê Komeleya Berî Her Tîştî Zarok berpirsiyar e û bi ti awayî fikrên Yekîtiya Ewropayê temsîl nake.

## Naverok

<i>Destpêk</i> .....	6
Hiqûqa Navneteweyî û Mafên Zimanî .....	7
Rewşa Mafên Zimanî û Çandî ya Kurdan a li Tirkiyeyê .....	9
Armanç û Çarçoveya Çavdêriya Mafên Zimanî û Çandî .....	14
Komxebata Tora Ziman û Çanda Kurdî .....	15
Rewşa Mafên Zimanî û Çandî ya li Tirkiyeyê û Pêşniyarên ji bo Parastin û Xurtkirina Bikaranîna Kurdî .....	18
Xalên Hevpar ên Maseyan .....	18
Maseya Nivîskaran .....	22
Maseya Weşangeran .....	24
Maseya Çandê .....	26
Maseya Hunerê .....	27
Maseya Ziman û Perwerdeyê .....	29
Maseya Odeyên Pîşeyî û Sendîkayan .....	31
Maseya Akademîsyen û Sosyolîngûîstîkê .....	32
Maseya Saziyên Hiqûq û Mafan .....	34
Maseya Karsazan .....	35
Maseya Ragihandinê .....	35
Maseya Saziyên Jinan .....	37
Maseya Saziyên Zarokan .....	38
Tora Ziman û Çanda Kurdî .....	39
Meclîsa Giştî û Sekreteryaya Torê .....	40



## Destpêk

Her peyvek, her gotinek, her têgihek, têgînek bêguman di her zimanekî de, ji bo her neteweyekê hem xwediyê wateyêke giştî ye hem jî xwediyê wateyêke xwereng e. Ji bo vê yekê jî, di Kurdî de û ji bo Kurdan belkî jî mînakên ku pêşî bîn hiş mirovan û yên herî girîng **'zîman'** û **'çand'** in.

Ji bo van têgînan her çî qas bi awayekî giştî pênaseyên wek *'zîman, navgîneke ragihandinê ye'* û *'çand, tevahiya nîrxên mirovahiyê yên madî û manewî ye ku ji nîfşekî bo nîfşê din tê veguhastin'* bîn bikaranîn jî, bi awayekî xwerengê gelê Kurd bêguman mirov dikare bi dehan awayên cuda pênaseya van têgînan bike û wan pênaseyên xwereng bide pêşiya pênaseyên gelemperî. Lewra Kurdên ku ji 'xwebûn'a xwe razî ne, hez dikin û doza parastin û domandina 'hebûn'a xwe dikin wateyên gelekî giran li van têgînan dikin, wek hîmên bingehîn ên 'hebûn'a xwe dibînin, pênaseyên van têgînan ên wek *'zîman nîşaneyê nasnameya hevpar e; zîman dergûşa çandê ye; zîman embara ezmûnan e; zîman dîroka palaftî ye; zîman parzûnê demê ye; zîman hebûn e; çand nasnameya gelekî pêk tîne; çand şeweya fikr û ramana civakê ye; çand dîroka li roja îro ye; çand berhema herî mezin a mirovahiyê ye'* û hwd didin pêş.

Komxebata ku biryara avakirina Tora Zîman û Çanda Kurdî jê derket a ku di 11 û 12ê rêbendana 2020an de li Amedê hat çêkirin jî bi vê bîr û baweriyê hat çêkirin. Kesên ku beşdarî vê civînê bûbûn, ew kes bûn ku di qadên zîman û çandê de bi xwebexşiyêke mezin bi salan ked dane; ew kes bûn ku di qadên nivîs, raman, zîman û çandê de her tim li pêş bûn; ew kes bûn ku hemû berpirsiyariyên ku ketine ser milên xwe pêk anîne û ew kes bûn ku bi ked, hêvî û dilsoziyêke mezin hewl dane ku dengê Kurdî û rengên Kurdan di hemû qadên jîyanê û cîhanê de berz bikin. Ev pêkhatiya ku pirreng û afirîner e dê bêguman ji bo raya zîman û çanda Kurdî pêşeng û rewnaqker be.

Ev xebata li ber destê we jî xebateke çavdêriyê ye ku li ser vê civînê hatiye kirin. Hem ji bo 'Bîr'a Torê û hem jî ji bo raya giştî ya Kurdan û cîhanê nûsafek e. Bêguman di vê nûsafê de keda gelek kesan heye ku navên wan yek bi yek mirov nikare bide lê ez dixwazim ji bo teşwîq û dehfdana wê, xwîşka hêja Cewahir Sadak Duzgun û ji bo sebr û rênîşandêriya wî kekê hêja Dr. Cuma

Çîçek bi taybetî bi bîr bînim û spasîyên xwe pêşkêşî wan û hemû xwebexş û xîretkêşên din ên ku beşdarî Komxebata Tora Ziman û Çanda Kurdî bûbûn, bikim. Bi hêviya ku ev nûsafa ku di rewşeke giştî ya awarte de hatiye amadekirin bi kêrî parastin û pêşvebirina ziman û çanda Kurdî were.

### **Hiqûqa Navneteweyî û Mafên Zimanî**

Mafên zimanî ango mafên têkildarî zimên di hiqûqa navneteweyî de bi giranî di çarçoveya mafên çandî û mafên perwerdehiyê de bi awayekî berfireh tên nirxandin. Li gorî hiqûqa navneteweyî, ev maf mafekî sîvil û mirovî ye û nîşan dide ku mirov xwedî wî mafî ne ku ziman an jî zimanan bi awayekî takekesî û kolektîf di qadên taybet û giştî/cemawerî de ji bo ragihandinê bi kar binîn.

Di qada navneteweyî de, hem di nav gelek dewlet û yekîtiyên dewletan de û hem jî di nav gelek sazîyên civakî, çandî, parastina mafan, pêşverû û sîvil de li ser mafên zimanî û çandî lihevkirineke giştî heye. Bi gelek peymanên navxweyî û navneteweyî gelek gel û dewletan ev mafên mirovî yê sereke girtine bin ewlehiyê û bi van peymanan ji raya giştî ya cîhanê jî tê xwestin ku hemû kes, sazî û dewletên li derveyî van peymanan mane jî rê û rêzikên ku di van peymanan de hatine diyarkirin bipejirînin û bisepînin.

Daxuyaniya Mafên Mirovan a Gerdûnî (*Universal Declaration of Human Rights*) ya ku ji 30 xalan pêk tê û di dawiya sala 1948an de, di danîşîna 183emîn a Lijneya Giştî ya Yekîtiya Neteweyan a li Parîsê de hatiye pejirandin, peymana parastina mafên mirovan a herî girîng, bibandor û esasî ye û ew peyman e ku herî zêde tê zanîn. Her wiha Peymana Mafên Aborî, Civakî û Çandî ya Navneteweyî (*International Covenant on Economic, Social and Cultural Rights*) ya ku di sala 1966an de hatiye amadekirin û hatiye dengdanê û di sala 1976an de ketiye meriyetê; Daxuyaniya Mafên Zimanî ya Gerdûnî (*Universal Declaration of Language Rights*) ya ku di sala 1996an de hatiye daxuyandin; Peymana Parastina Zimanên Kêmaran û Zimanên Herêmî ya Ewropayê (*European Charter for Regional and Minority Languages*) ya ku di sala 1992yan de hatiye morkirin; Peymana Mafên Zarokan (*Convention on the Rights of the Child*) a ku di sala 1989an de hatiye morkirin; Peymana Navneteweyî ya Mafên Siyasî û Takekesî (*International Covenant on Civil and Political Rights*) ya ku di sala 1966an de hatiye çêkirin; Peymana Parastina Azadiyên Bingehîn û Mafên Mirovan (*Convention for the Protection of Human Rights and Fundamental Freedoms*) a ku di sala 1950yê de hatiye morkirin; Manifestoya Gironayê ya li ser Mafên Zimanî (*Girona Manifesto on Linguistic Rights*) ya ku di sala 2011an de

ji aliyê Komîteya Mafên Ziman û Wergerê ya PENa Navneteweyî ve hatiye amadekirin û di heman salê de ji aliyê Meclîsa Giştî ya PENa Navneteweyî ve di Civîna Giştî ya 77emîn de hatiye pejirandin û daxuyandin çend mînak in ku mirov dikare bide. Li gel van lihevkerînan navneteweyî, gelek kom, kêmar, sazî û dewletên ku ne alîyekî van peymanan in jî di çarçoveya wan xalên esasî de ku di van peymanan de hatine destnîşankirin li gor rewşa xwe ya xwereng peymanên navxweyî çêkirine.

Çend xalên sereke û hevpar ên van peymanan ev in ku di Daxuyaniya Mafên Zimanî ya Gerdûnî de jî cih girtine û mirov dikare wek mînak bide:

*\* Rewşa her zimanî têkildar e di gel encama gelek kartêkerên siyasî, hiqûqî, bîrdozî, dîrokî, gelheyî û rewşa axa ku li serê dijîn a aborî, civakî, çandî, zimanî, sosyolîngûistîk, navzimanî û xwezaya mirovî yên yekbûyî. (Destpêk)*

*\* Hemû ziman nasnameyêke kolektîf a diyar, rengên cuda yên têgihîştina rastiyê û awayê vegotina wan dinimînin. Ji ber vê yekê jî hemû ziman ji bo ku di hemû qadên vatîniya xwe de bi pêş bikevin, divê xwediyê wê şîyanê bin ku derfetên pêwîst bi dest bixin. (Xala 7emîn)*

*\* Hemû ziman bi awayekî kolektîf tînan afirandin û wek navgînên lihevkerîna civakê, pênasekirin, ragihandin û xwegotina afirîner ji bo takekesan tînan pêşkêşkin. (Xala 7emîn)*

*\* Hemû komên zimanî xwediyê wî mafî ne ku di nav wê axê de ku li serê dijîn zimanê xwe bi awayekî fermî bi kar bin. (Xala 15emîn)*

*\* Hemû komên zimanî xwediyê wî mafî ne ku di nav wê axê de ku li serê dijîn rêbazên zagonî, rêgezên awayê rêvebirinê, belgeyên giştî û taybet û girtenameyên giştî yên ku tînan tomarkirin ji bo ku kartêker û derbasdar bin, bi zimanê ku di nav wê axê de tê bikaranîn bînan amadekirin û tu kes nikare hebûna wî zimanî înkâr bike. (Xala 15emîn)*

*\* Perwerdehî divê hêzê bide koma zimanî ya ku li ser axa perwerdehî lê tê dayîn dijî da ku bikare ji aliyê zimanî û çandî ve xwe vebêje. (Xala 23emîn)*

*\* Perwerdehî li ser axa ku tê dayîn, divê bibe alîkar da ku ew ziman xwe bi domîne û bi pêş ve bibe ku ji aliyê koma zimanî ya wê axê ve pê tê axaftin. (Xala 23emîn)*

*\* Perwerdehî divê her tim di xizmeta tîkiliyên lihevkerîna cudahiyên çandî, cudahiyên zimanî û hemû zimanên cuda yên li cîhanê de be. (Xala 23emîn)*

*\* Di çarçoveya van rêgezan de mafê her kesî heye ku bikare zimanê ku bixwaze, hîn bibe. (Xala 23emîn)*

*\* Hemû komên zimanî xwediyê wî mafî ne ku di her cure çalakiyên çandî de zi-*



*manê xwe bi kar bînin, bidomînin, biparêzin û bi pêş ve bibin. (Xala 41emîn)*

*\* Hemû komên zimanî, bêyî ku beşek ji qada wê komê bi dagirkeriya çandeke biyanî re rû bi rû bimîne, divê bi dilê xwe vî mafî bi kar bînin. (Xala 41emîn)*

*\* Mafê hemû komên zimanî heye ku hemû çalakiyên civakî û aborî yên li ser axa ku lê dijîn, bi zimanê xwe pêk bînin. (Xala 47emîn)*

*\* Hemû endamên komeke zimanî yên ku li ser axa ku kom lê dijî ji bo ku bikarin kar û pîşeyên xwe bikin, divê bikarin hemû belge, destûrname, fermanname, form, belgeyên dijîtal û navgîn û berhemên wan bi zimanê xwe bi dest bixin. (Xala 47emîn)*

Her wiha di destpêka Peymana Mafên Aborî, Civakî û Çandî ya Navneteweyî de wiha hatiye gotin ku dikare wek çarçoveyeke giştî li vê derê bê dayîn:

*Bi liberçavgirtina wê yekê ku di rêgezên Peymana Neteweyên Yekbûyî de hatiye daxuyandin, naskirina rûmeta zikmakî û ya wekhev û naskirina mafên hemû endamên malbata mirovahîyê ku nayêne dewrêkirin bingeha azadî, dad û aşîtiya cîhanê ye,*

*Divê bê pejirandin ku ev maf bingeha xwe ji rûmeta ku encama hebûna mirov e digirin; li gor Daxuyaniya Mafên Mirovan a Gerdûnî, ji bo ku armanca mirovên azad ku ji tirs û xizaniyê rizgar bûne û azadiya xwe bi dest xistine pêk bê, divê ew şert û merc bînin afirandin ku her kes li gel mafên takekesî û siyasî bikare mafên xwe yên aborî, civakî û çandî jî bi kar bîne.*

Li gor Peymana Neteweyên Yekbûyî, divê hemû dewletên li cîhanê li hemberî maf û azadiyên mirovan rêzdar bin û wek berpirsiyariyekê sepandina wan teşwîq bikin û neyê jibîrêkirin ku takekesê ku li hemberî takekesên din û civaka ku endamê wê ye, xwedî berpirsiyarî ye û divê rêzê nîşanî mafên ku di vê Peymanê de hatine destnîşankirin bide, hewla sepandina van mafan jî berpirsiyariya wan dewletan e.

## **Rewşa Mafên Zimanî û Çandî ya Kurdistan a li Tirkiyeyê**

Wek dewletekê Tirkiyeyê jî û gelek sazî û dezgehên sîvîl ên li Tirkiyeyê jî ji bo gelê Tirk ev peyman girîng û kêrhatî dîtine û bûne alî, palpişt û piştevanên van peyman û daxuyaniyan. Di vê mijarê de pirsgerêka herî mezin a gelên din ên li Tirkiyeyê, di serî de gelê Kurd, ev e ku Tirkiyeyê bi “hostatiyeke li gor xwe û ji bo xwe” dûreparêzî danîne ser xalên di van peyman û daxuyaniyan de yên ku dê gelên din ên li Tirkiyeyê jî bikarin jê sûdê wergirin. Bi vî awayî

hemû peyman û daxuyaniyên navneteweyî ku ji aliyê Tirkiyeyê ve hatine erê-  
kirin, berî ku bikevin nav sînorên Tirkiyeyê bûne *yekneteweyî*. Ji ber paras-  
tina yeknetewetiya xwe, Tirkiye her tim bi tirs û guman nêzî van peyman û  
daxuyaniyan bûye û bi giranî bi derengî ew pejirandine. Wek mînak, li gel ku  
Peymana Navneteweyî ya Mafên Aborî, Civakî û Çandî di sala 1966an de ha-  
tiye amadekirin û di sala 1976an de ketiye meriyetê jî, Tirkiyeyê ev peyman  
di dawiya sala 2003yan de destnîşan kiriye. Her çi qas li gor peymanên bi vî  
rengî divê lijneyên çavdêriya sepandina van peymanan hebin û hem ji aliyê  
van lijneyan ve û hem jî ji aliyê wan dewletan ve ku aliyên van peymanan in  
nûsafên demkî werin amadekirin jî, mixabin ev kar bi ser û ber nayên kirin,  
karên ku tên kirin jî bi çavên dewletî û di çarçoveya zagonên dewletî de tên  
kirin. Dîsa mirov dikare heman peymana navborî ya ku Tirkiyeyê di sala  
2003yan de destnîşan kiriye di vê mijarê de bike mînak: Li gel ku çend caran  
hincetên cuda nîşan dane û ji Lijneya Giştî zêdetir dem xwestiye jî, heta ku çar  
sal di ser re derbas bûne jî, Tirkiyeyê peywir û berpirsiyariyên xwe yên bin-  
gehîn ên li hemberî aliyên din ên vê peymanê pêk neanîne û encamên çav-  
dêriyên xwe yên di van mijaran de ranegihandine raya giştî.

Kurd, li Tirkiyeyê, li ser parçeya axa ku lê dijîn nikarin mafên xwe yên zîmanî  
bi kar bînin, gelek encamên neyînî yên vê rewşê li ser derûniya takekes û civakî  
bandorê dikin û bi heman awayî dikin ku çand û zîmanek ber bi mirin û tunebûnê  
ve biçin. Wekî ku di peymanên bi vî rengî de bi hûrgilî û bi awayekî zelal hatiye  
destnîşankirin, mafê Kurdan jî heye ku wek gelekî, bi çand û zîmanê xwe bijî û  
mafên xwe yên ku bingeha xwe ji hebûna xwe digirin bi kar bînin.

Lêkolîna ku ji aliyê Rawest Lêkolînê ve li bajar û bajarokên Amed, Mêrdîn,  
Riha, Wan, Agirî, Çewlik, Şirnex û Dêrsimê di nav Îlon û Kewçêra 2019an de hate  
kirin, nîşan dide ku li gel polîtîkayên pişavker, zîmanê Kurdî di nav navsere û kal  
û pîran de zîmanekî zindî ye, lê di nav zarokan de her ku diçe kêr dibe. Li gorî  
encamên lêkolînê, zarokên ku bi dê û bavên xwe re bi Kurdî yan jî hem bi Kurdî  
hem jî bi Tirkî diaxivin bi tenê %35 e. Kesên ku dikarin bi zîmanê xwe yê dayîkê  
hem dikarin bixwînin û hem jî binivîsin bi tenê %16 e. Ji beşdaran %6 zîmanê  
xwe yê dayîkê qet nizanin, %15 fam dikin, lê nikarin biaxivin, %63 dikarin bixi-  
vin lê xwendin û nivîsandina wan tune ye. Li gel vê rewşa xeternak, %88ê dê û  
bavan dixwazin zarokên wan zîmanê wan ê dayîkê (kurmançî/zazakî) hîn bibin.  
Dîsa %83ê dê û bavan dixwazin zarokên wan li dibistanan yan bi temamî bi Kurdî  
yan jî duzîmanî (hem Kurdî hem jî Tirkî) perwerde bibin.<sup>1</sup>

1 Rawest Araştırma, *Ebeveyn ve Çocuk Arasında Ana Dilin Durumu: Saha Araştırması Bulguları* – Özet, Eylül-Ekim 2019, [https://rawest.com.tr/wp-content/uploads/2020/02/Ebeveyn\\_Ana\\_Dil\\_Arastirmasi.pdf](https://rawest.com.tr/wp-content/uploads/2020/02/Ebeveyn_Ana_Dil_Arastirmasi.pdf).

Sedema bingehîn a pirsgirêka çandî û zimanî ya Kurdî felsefe û kodên bingehîn ên damezirandina Tirkiyeyê ye. Destûra bingehîn, zagon, rêzîkname û mewzûata li Tirkiyeyê hemû bi armanca afirandina neteweyeke yekreng û yekdeng hatine amadekirin û sepandin. Di pêvajoya bi qasî sed salan de polîtîkayên çandî û zimanî li gor vê yekê hatine amadekirin û her hikûmeta ku bûye desthilatdar li gor van pîvanan ev polîtîka ji nû ve zindî kirine, teşeyê nû dane wan û li gor şert û mercên rojane sepandine. Di rewşa îroyîn de jî desthilatdariya heyî bi heman awayî tevdigere û ji bo bikaranîna mafê zimanî, afirandina derfetên bikaranîna vî mafî û pêşvebirina ziman tu tiştî nake. Dijberî vê yekê çî bi awayekî veşarî, çî jî aşkere, polîtîkayên bişaftinê bi hemû hêza xwe tîne sepandin. Ev jî dibe sedem ku Kurd ji mafên xwe yê çandî û zimanî bêpar bimînin. Bingeha pirsgirêkê ev e.

Ji ber hebûna vê pirsgirêkê Kurd çî wek takekes, çî jî wek komeke çandî û zimanî, bi gelek pirsgirêkan re rû bi rû dimînin. Bînpêkirin û bikarneanîna mafan li aliyekî, ev yek êdî dibe sedema gelek pirsgirêk û nexweşiyên derûnî û civakî. Ji ber ku di hemû qadên xizmeta giştî de zimanê Kurdî qedexe ye, mirov nikarin ji wan xizmetan sûdê werbigirin û tevî ku wek hemwelatî her yek ji wan berpirsiyariya xwe ya li hemberî zagonan bi cih tîne û baca xwe dide jî, nikare mafên xwe yê bingehîn bi kar bîne. Wek mînak, Kurdên ku bi Tirkî nizanin dema ku diçin nexweşxaneyê, nikarin pirsgirêkên xwe bibêjin û ji ber vê yekê jî nexweşîya wan baş nayê tesbîtkirin û dermankirin, lewma ev yek dibe sedema trawmayên mezin. Ev yek bînpêkirina mafê tenduristîyê ye û pê re jî bînpêkirina mafê jiyane ye.

Dîsa li gor encamên lêkolîna bi navê Pirsgirêkên ku di *Têkiliyên Navbera Nexweş - Bijîşk - Dermansazan de ji ber Zimên Derdikevin Holê* ya ku ji aliyê DÎTAMÊ (Navenda Lêkolînên Civakî ya Dîcleyê) ve di Adara 2012an de li Amedê hatiye kirin, zimanê dayikê yê nivê bijîşkên ku li Amedê peywirdar in Tirkî nîn e. %17.7ê bijîşkan pirî caran, %46.4ê bijîşkan carinan, bi giştî %64.1ê bijîşkan; %26.2yê dermansazan pirî caran, %45.2yê dermansazan carinan, bi giştî %74.4ê dermansazan rastî pirsgirêkan tîne wexta ku têkiliyê bi nexweşan re datînin.<sup>2</sup>

Heman pirsgirêk û trauma di hemû qadên jiyane yê wek perwerdehî, çandî, aborî û siyasî de jî diqewime. Wek mînak, di xala 42yemîn a destûra bingehîn a Tirkiyeyê ya têkildarî perwerdehiyê de li gel ku di destpêka xalê de tê gotin ku “Tu kes ji mafê perwerdehî û hîndekariyê nikare bê par bê hiştin” jî, di benda dawîn a heman xalê de tê gotin ku “Ji derveyî Tirkî tu zimanekî din

<sup>2</sup> Diyarbakır’da Hasta-Hekim-Eczacı İletişiminde Dilden Kaynaklanan Sorunlar Araştırması. <https://ditam.org/wp-content/uploads/2019/08/Saglikta-Dil-Sorunu-1.pdf>

di sazî û dezgehên perwerdehî û hîndekariyê de wek zimanê dayikê ji bo we-latîyên Tirk nayê hînkirin û pê perwerdehî nayê dayîn” û bi vî awayî Kurdî rasterast hatiye qedexekirin û li derveyî pergala perwerdehiyê hatiye hiştin.

Bûyereke din a têkildarî vê mînakê, di encama daxwaz û têkoşîna salên dûr û dirêj a Kurdan de, di çarçoveya wan reformên lihevkerinê de yên bi Yekitiya Ewropayê (YE) re desthilatdariya heyî neçar ma ku di hinek qadan de hinek gavan bavêje û li hinek zanîngehan “polên Kurdî” hatin vekirin. Ji ber vê hişmendiyê navên “Kurdî” lê nehat kirin û gotin “zimanên zindî”. Mafên zimanî li aliyekî, bilêvkirina navê ziman bi xwe jî ji bo xwe wek pirsgirêkekê dibînin. Ev mînak bi tenê ji bo perwerdehiyê ne lê di hemû qadên giştî û qadên jiyane de heman nêzîkatî û hişmendî heye.

Di dadgehan de xweparastina bi zimanê dayikê hatiye pejirandin lê kesên ku di saziyên sivîl ên Kurdan de perwerde bûne, li ser Kurdî xebitîne nikarin li wan dadgehan wergerê bikin, tenê yên ku ji saziyê dewletê belgeyek standibin dikarin wergêriya “sûcdar” û “bersûc”ên ku bixwazin bi zimanê dayikê xwe biparêzin bikin. Bi vî awayî jî pirsgirêk çareser nabe, barê lêçûnan ê ji bo wergêr û wergerê jî li ser piştta “sûcdar” û “bersûc”an e.

Mafê derxistina rojnameyê bi zimanê dayikê hat dayîn û serokkomarê Tirkiyeyê di axaftina xwe ya li Parlamentoya Ewropayê de ev yek wek mizgîniyê mezî ragihand. Lê çend roj piştî wê axaftina ku tê de “mizgîniya azadiya ramanê” dihat dayîn ew rojnameya ku tekane rojnameya rojane ya bi Kurdî bû ji ber ku nûçeyên li gorî ji bo dewletê çênekiribûn hat girtin, qedexekirin û krîmînalîzekirin. Her wiha rojname, ajans, malper, kovarên ku bi Kurdî dihatin weşandin jî hatin girtin, kartên çapemeniyê yên xebatkarên wan hatin betalkirin, doz li wan hatin vekirin, hatin girtin û hwd.

Dayîna dersên bijarte hat pejirandin û Kurdî êdî dikare li dibistanan hefteyê du saetan wek derseke bijarte bê hilbijartin û bê hînkirin. Lê ji bo vê yekê divê pêşî zarok were bişafîtin, heta pola çaran ji zimanê xwe yê dayikê were dîrxistin, piştî ku bigihîje pola çaran jî, ji bo ku zimanê xwe yê dayikê wek *zimanekî biyanî* bikare hîn bibe, divê di demekê de ku dibistan girtî ne vê daxwaza xwe ragihîne dibistana xwe, divê di heman polê de çend kesên wek xwe peyda bike, divê hemû şert û mercên ku tên xwestin bi cih bên, divê li wê dibistanê mamoste hebe, ku ji bo milyonan zarokên Kurd hejmara van mamosteyan li tevahiya Tirkiyeyê ne 30 kes in jî û hwd. Piştî gelek şert û mercan, heger ku mûcîzeyek pêk bê, dê zarok bikare dersa Kurdî bigire, lê dê malbata wî bizane ku dewlet bi vê daxwaza wan dizane, hatine nîşankirin.

Wek “reformeke mezî” a ku her roj mineta wê li Kurdan tê kirin jî vekirina ka-

naleke televîzyonê ya dewletê ye. Ev televîzyon televîzoyonek e ku hewl dide armancên dewletê yê li hemberî Kurdan bi ‘dûblajeke xerab’ a Kurdî pêk bîne. Di vê televîzyonê de armanc û hewla sereke ew e ku Kurdî wek zimanekî lawaz, qels û kêr ê bindest û ketiyan ê ku ji bilî qerf û henekên ku Kurdan biçûk dixînin têrî tu tiştêkî nake, were nîşandan. Bikaranîna peyvên ku piştevanên fikreke siyasî ya muxalîf bi kar tînin di vê kanalê de qedexeyê, bi “dûblajeke qaşo Kurdî” ya xerab weşaneke bi giştî li dijî ziman û çanda Kurdan tê kirin. Her çî qas peyvên ku tên bikaranîn Kurdî bin jî, fîlm û rêzefilmên ku tên nîşandan ji çanda Kurdan gelekî dûr in. Di sala 2015an de navê vê kanala dewletê kirin “Kurdî”, di 2016an de bi yek derbekê 12 kanalên televîzyonê û 11 kanalên radyoyê yê Kurdî hatin girtin û qedexekirin ku di nav van kanalên de Zarok TVya ku ji bo zarokan weşan dikir jî hebû.

Serokkomarê Tirkiyeyê li Amedê “cihên ku Kurd lê dijîn” jê re got Kurdistan, di heman demê de sansureke nû li dijî navê Kurdistanê di arşîvên osmanî de hat kirin û ji navê beşa “Mesailî Muhîmmeî Kurdistan” peyva Kurdistanê hat derxistin. Serokkomarê wê demê cara pêşîn navekî resen ê bajarokekî Kurdan bi kar anî û got “Norşîn”, li hemberî wî ji aliyê raya giştî ya Tirkî û endamên partiya serokkomar û piştevanên serokkomar ve êrîşeke mezin dest pê kir. Ji bo ku navên resen ên cih û waran li wan bînan vegehandin hîna tu xebatek nehatiye kirin, berovajiyê wê, navên ku şaredariyên Kurdan li cih û parkan, kuçe û kolanan dikin jî tên veguherandin.

Biryar hat dayîn ku cejna Newrozê êdî ji aliyê nûnerên dewletê ve jî bê pîrozkirin û xwedîderketin lê were kirin lê navê wê divê Nevruz be. Şaredarê Bajarê Mezin ê Amedê ji ber ku vexwendnameyeke bi tîpa “w”yê amade kiribû û Newroz nivîsandibû û ew vexwendname ji parêzgar û dozgerên bajêr re şandibû, doz lê hat vekirin û hat darizandin.

Kurd ‘êdî’ dikarin navên bi Kurdî li zarokên xwe bikin lê nikarin navên zarokên xwe bi alfabeya Kurdî bidin tomarkirin. Nikarin navê bi Kurdî, Jiyar, di spartekekê de ku mamosteyên wan ji bo dibistanê ji wan xwestiye, di mînakekê de bidin, di pergala dewletê de ew nav wek J... tê sansurkirin; yan jî mamosteyekî ku “dilsozê dewleta xwe ye” dikare navê zarokekî Kurd, Biryar, li gor dilê xwe biguherîne, bike Ramazan û ji bo ku “ji bîr neke” li ser milê wî binivîsîne. An jî Kurdek nikare navê şirketeke bazirganiyê bi tîpên Kurdî bide nivîsandin. Her wiha di parlamentoya Tirkiyeyê de hîna jî zimanê Kurdî wek “xxxxx - zimanekî ku nayê zanîn” derbasî girte-nameyên danîşînên parlamentoyê dibe. Ev mînak bi tenê çend mînakên biçûk in û mînakên bi vî rengî mijarên lêkolînên dûr û dirêj û berfireh in û nikarin di nivîseke bi vî rengî de werin bicihkirin.

## **Armanç û Çarçoveya Çavderiya Mafên Zimanî û Çandî**

Ji aliyekî ve xebatên Kurdan ên di qada çandî û zimanî de didomin û ji aliyê din ve jî pirsgirêkên wan ên di van qadan de û polîtîkayên desthilatdariyê yên bişaftinê didomin. Ji ber vê rewşê jî pêdivî bi şopandin, tomarkirin û nûsafkirinê heye. Bi amadekirina van nûsafan dê derbarê van xebat û pirsgirêkan de arşîvek çêbibe ku ev arşîv jî paşê bibe bingeha lêkolînên cihêreng ên ku dê di vê qadê de bîn kirin.

Di çarçoveya çavderiya mafên zimanî û çandî de dê agahî bîn berhevkerin û tomarkirin, bi kes û saziyên têkildar re û yên ku pêdiviya wan bi wan agahiyan heye bi wan re bîn parvekerin. Ji ber ku heta niha şopandin, tomarkirin û nûsafkirina xebatên ku hatine kirin bi awayekî rêkûpêk nehatiye kirin gelek xebat hatine jibîrkirin, agahiyên derbarê wan de zêde nayên zanîn, lêkolîner û nîfşên nû ji wan ez-mûnan bêpar dimînin. Tora Ziman û Çanda Kurdî bi xwe jî dê bi van nûsafan rewşa xwe binirxîne û ji bo dahatûyê bernamewên pêwîst amade bike.

Sedemeke din a amadekirina van nûsafan jî bi awayekî rojane agahdarkirina raya giştî, çi neteweyî û çi jî navneteweyî, berhevkerin û belavkirina agahiyên rast û objektîf ku bibe cihê pêbaweriyê yê sazî û dezgehên din jî. Bi vî awayî dê hem di qada neteweyî de agahdarbûn û şiyariyek çêbibe û hem jî dê derfeta xwegihandina qada navneteweyî û agahdarkirina raya navneteweyî bê bidestxistin. Ji bo ku mafên ku di peymanên navneteweyî de hatine destnîşankirin bikarin bîn bikaranîn û sepandin ev xebat girîng in. Ji bo ku rewşa van peymanan a li Tirkiyeyê ji aliyê raya giştî û aliyên wan peymanan ve bi awayekî rast û dirust bê zanîn pêdivî bi van xebatan heye.

Di çarçoveya çavderiya mafên zimanî û çandî de, li gor van armancan, wek destpêk, dê şeş nûsaf werin amadekirin. Nûsafên ku hatine diyarkirin ev in:

1. Nûsafêke nîrxandina Komxebata Tora Ziman û Çanda Kurdî
2. Nûsafa nîrxandina xebata rapirsîna ku di dema komxebatê de di nav beşdarên komxebatê de pêk hat.
3. Nûsafêke tematîk a derbarê zarokan û mafên zimanî de.
4. Nûsafêke tematîk a derbarê mafên perwerdehî û zimanî de.
5. Nûsafêke tematîk a derbarê mafên tendirustî û zimanî de.
6. Nûsafêke tematîk a derbarê mafên nivîskaran û zimanî de.

Ev nûsaf çavdêriya mafên zimanî û çandî û analîz û nîrxandinên li ser Komxebata Tora Ziman û Çanda Kurdî dihewîne. Komxebat di 11 û 12ê rêbendana 2020an de bi beşdariya derdora 300 çalakvanên serbixwe, nûnerên gelek saziyên sivil ên civakî yên cihêreng û ji bajarên cuda li Amedê hat lidarxistin.

## **Komxebata Tora Ziman û Çanda Kurdî**

Bi taybetî piştî salên 2000î li Tirkîyeyê gelek hewl û xebatên li ser ziman û çanda Kurdî hatine kirin. Di çarçoveya van hewl û xebatan de gelek sazî hatine vekirin, tevgerên girseyî yên girîng pêk hatine û konferansên neteweyî yên qadî hatine lidarxistin. Wek mînak, di sala 2004an de Kurdî-Der hat damezrandin ku dê paşê nêzî 40 şaxên wê li gelek bajarên Tirkîyeyê vebûna. Kursên fermî yên Kurdî hatin vekirin. Di 2004an de Enstîtuya Kurdî ya Amedê hat avakirin. Di 2004an de Komeleya Nivîskarên Kurd hate damezrandin. Di 2005an de TZP Kurdî ya ku di bin banê wê de gelek sazî û kes hebûn hat damezrandin. Di Adara 2012an de Konferansa Neteweyî ya Zimanê Kurdî bi beşdariya bi sedan zimannas, rewşenbîr û nivîskarên hat lidarxistin û di vê konferansê de TZP Kurdistanî hat avakirin. Dîsa bi beşdariya bi sedan hunermend û akademîsyenan di 2012an de Konferansa Çand û Hunera Kurdî hat lidarxistin.

Her wiha bi destê şaredariyên Kurdan li gelek bajar û bajarokan gelek mîhrîcanên çand, huner, şano, sînema, wêje, zarok û hwd hatin lidarxistin. Wek tekane rojnameya Kurdî ya ku di destpêka salên 1990î de ji hefteyê carekê dihat weşandin, Azadiya Welat, di Gelawêja 2006an de êdî bi awayekî rojane weşana xwe domand. Di vê pêvajoyê de gelek weşanxaneyên ku bi Kurdî weşan dikirin hatin vekirin, kovarên çandî, hunerî, wêjeyî, zimanî hatine weşandin. Her wiha li şaredariyên ku Kurdan bi dest xistin xizmetên pirzimanî hatin kirin, Kurdan li dadgehên xweparastina bi Kurdî dan qebûl kirin, bi dehan TV û radyoyên herêmî yên ku bi Kurdî weşana xwe dikirin jî bandoreke erênî ya zêde kirin.

Van geşedanên erênî yên ku roj bi roj zêdetir bandor li civakê dikirin piştî hewla darbeyê ya 2016an darbeyeke mezin xwarin û ji bo Kurdan pêvajoyê rengekî nêyînî wergirt. Piştî vê hewla darbeyê, rewşa awarte hat ragihandin, her çi qas kêr û qels bin jî, zagonên heyî ji meriyetê hatin hilanîn û Tirkîye bi biryar-fermanan (KHK) ku li gor rewşa rojane dihatin derxistin, hat birêvebirin. Piştî hewla darbeyê dewletê ev pêvajo û hêza ku ket destê wê bi kar anî ji bo sepandina hişmendî, felsefeya bingehîn û kevneşopiya komarê, êrîşa herî mezin bir ser Kurdan. Di demeke kin de bi sedan saziyên wek kanalên televîzyonê, kanalên radyoyê, ajansên nûçeyan, weşanxane, rojname, kovar, malper hatin girtin û qedexekirin. Saziyên ziman û çandî yên wek *Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê*, *Kurdî-Der*, *Komeleya Nivîskarên Kurd*, *Navenda Çanda Mezopotamya*, *Konserwatiwara Aram Tigran*, *Akademiya Cegerxwîn*, *Akademiya Nûda*, *Akademiya Ehmedê Xanî*, *Zarokistan*, *Malên Piştgiriya Perwerdehiyê*, *Dibistana Azad a Ferzad Kemanger* û hwd hatin girtin, doz li rêveber û xebatkarên wan hatin vekirin, hatin binçavkirin û girtin. Li tevahiya Tirkîyeyê

kes, sazî û dezgehên Kurd û Kurdewar hatin krîmînalîzekirin, bi tawanên mezin hatin tawanbarkirin, qeyûmên ku di dewsa şaredarên Kurd de hatin peywirdarkirin pêşî tabelayên bi Kurdî daxistin, navên bi Kurdî yên ku li kuçe, kolan, park û avahiyan hatibûn kirin veguherandin.

Her çî qas ji bo damezirandina sazî û tevgerên sîwanî gelek hewl hatibin dayîn jî, ji bo xurtkirina têkiliyên navbera kes û saziyên ku di van qadan de xebatên xwe didomînin hewlên girîng û giranbuha hatibin dayîn jî, li gel bi caran tesbîtkirin û destnîşankirina girîngiya hevgerîna û birêxistinbûnê jî, heta niha avaniyeke ku bikare vê valahiyê dagire û bi awayekî giştî û berfireh pirsgerêkên zîman û çanda Kurdî yên di hemû qadên jîyanê de destnîşan bike, ji bo çareserkirina van pirsgerêkan polîtîkayên giştî û rê û rêbazên ku dê bîna bikaranîna diyar bike û hem ji aliyê gelê Kurd ve û hem jî ji aliyê civaka derveyî Kurdan ve wek otorîte bê pejirandin, mixabin tune ye.

Li gel ku li aliyekî rewş bi vî awayî ye, li aliyê din jî polîtîkayên zimankujî û çandkujî yên ku bi salan e bi awayekî sistematîk tîna meşandin, xetereyên li ser zîman û çanda Kurdî zêdetir kirine. Ji bo têkbirina van polîtîkayan, çî wek sazî çî jî wek kes gelek hewl tîna dayîn û kar û xebat tîna kirin lê ji bo guhertina vê rewşê pêdivî zêdetir bi hevgerîna xurt, helwesteke zelal û bernameyeke karîger heye.

Ji bo ku helwesteke zelal derkeve holê, hevgerîna xurt û bernameyeke karîger ji aliyê pisporên qadî ve bê pêkanîn, piştî banga hatina gel hev a ku di encama komcivîna 22 û 23yê mijdara 2019an de ji aliyê 45 rewşenbîrên Kurd ve hat kirin, di 11 û 12ê Rêbendana 2020an de dê li Amedê bi beşdariya nêzî 300 kesên kedkar û xemxurên zîman û çanda Kurdî komcivînek bihata lidarxistin. Piştî komcivîna ku bi beşdariya 35 rewşenbîrên Kurd hatibû pêkanîn û bi giştî 45 kesên encamên ku ji wir derketibûn holê pejirandibûn û destnîşan kiribûn, biryara berfirekîna têkiliyan û beşdarkirina zêdetir kesên derket holê, sekreterayeyeke ku ji 3 kesên pêk dihat hat destnîşankirin û 42 kesên mayî jî wek endamên Lijneya Şêwrê hatin pejirandin. Bi biryar û pêşniyazên ku ji vê komcivînê derketin, bi sedan nivîskar, rewşenbîr, hunermend, akademîsyen, zimannas, hiqûqnas, çalakvanên civaka sîvîl û hwd re hevdiîtin hatin kirin û ji bo beşdarî û diyarkirina rojeva komxebatê û kesên ku dikarin beşdar bibin, mijarên ku dê xebat li serê bîna kirin ji bo wan bangewazî û vexwendin hatin kirin. Li gor çarçoveya xebatên ku ji aliyê Lijneya Şêwrê ve hatibûn diyarkirin, armanc ew bû ku nûneriya herî xurt a civakî û ramanî beşdarî komxebatê bibe. Bi vî awayî dê beşdariyek ji hemû qadên civakê pêk bihata û di nav van qadan de jî dê hewl bihata dayîn ku kesên ji ramanên cuda yên ku bikarin bi her awayî nûneriya civakê û ramanên berbelav ên di nav civakê de bikin, pêk bihata.

Di vê komcivînê de, ji aliyê amadekaran ve 12 tema/mase hatibûn diyarkirin



û li ser van maseyan pisporên ku ji bajar û herêmên cuda hatibûn dê di mijarên wek mafên zimanî, pêwendiya ziman û nasnameya neteweyî, avakirina rê û rêzikên xebatên sîvîl, êş, kêşe û arîşeyên navxweyî û derveyî yên ziman û çanda Kurdî, astengiyên bingehîn ên li ber ziman û çanda Kurdî bi berfirehî binirxandana. Ji bo her maseyê moderatorek û nîşegirek hat destnîşankirin û ji bo beşdariyeke xurt a ji hemû fikrên di her çadeke spesîfîk de xebat hatin kirin. Ji hemû beşdarên hemû temayan hat pirsîn ku divê wekî din kî jî li ser maseyê hebe û bi pêşniyazên endamên Lijneya Şêwrê û endamên diyar ên maseyan lîsteya kesên ku divê bîn vexwendin berfirehtir û dewlemendtir bû.

12 maseyên ku berî pêkhatina civînê moderator, nîşegir û endamên wan hatibûn diyarkirin ev bûn:

1. Maseya Nivîskaran
2. Maseya Weşangeran
3. Maseya Çandê
4. Maseya Hunerê
5. Maseya Ziman û Perwerdehiyê
6. Maseya Odeyên Pîşeyî û Sendîkayan
7. Maseya Akademîsyenan û Sosyolîngûîstîkê
8. Maseya Saziyên Hiqûq û Mafan
9. Maseya Karsazan
10. Maseya Ragihandinê
11. Maseya Saziyên Jinan
12. Maseya Saziyên Zarokan

Li ser pêşniyazên ku di Komxebatê de hatin kirin, hejmara van mase/temayan bû hijdeh. Maseyên din ên ku biryara sazkirina wan hat dayîn jî ev in:

1. Maseya Dîrokê
2. Maseya Werzîşê
3. Maseya Kirmanckî/Kirdkî
4. Maseya Dîn û Bawerîyan
5. Maseya Tenduristiyê
6. Maseya Pêwendî û Têkiliya di Navbera Zaravayên Kurdî û Zimanên din de

Her çî ças rojeva sereke ya vê komcivînê destnîşankirina pirsgirêkên ziman û çanda Kurdî û rê û rêbazên çareserkirina wan bû, ji ber ku ev komcivîn di rew-

şeke awarte de, di nav şert û mercên giran de û bi derfetên kêr be jî karîbû were lidarxistin, vê yekê hêviya beşdarên geştir kir û berê nîqaş û gengeşiyên di komcivîna de bi giranî da ser pêdiviya bi avaniyeke sîwanî û çawaniya wê û nîqaş û gengeşî di vê çarçoveyê de jî hatin kirin. Maseyên tematîk ku hatibûn diyarkirin di wan de hewla tesbîta êş, kêşe û arîşeyên heyî yên qadên spesîfîk û rê û rêbazên çareseriyê yên ji bo wan êş, kêşe û arîşeyan hat dayîn. Di encama van gengeşiyên de, wek bersivên pirsên ‘Çi?’ û ‘Çawa?’ yê her maseyekê di qada xwe de bi dehan tesbît û pêşniyazan ragihandin hemû beşdarên civînê.

### **Rewşa Mafên Zîmanî û Çandî ya li Tirkîyeyê û Pêşniyarên ji bo Parastin û Xurtkirina Bikaranîna Kurdî**

Di dawîya civîna durojî de, moderator û nîşegirên maseyan yek bi yek nîqaş û gengeşiyên ku li ser maseyên wan hatibûn kirin, pirsgerêkên ku hatibûn destnîşankirin û pêşniyazên rê û rêbazên ji bo çareseriyê wan pirsgerêkan hatibûn kirin ji hemû beşdarên civînê re ragihandin. Piştî ku bi beşdariyê xurt û bi nêrînên giranbuha gelek encamên girîng hatin bidestxistin û gelek rê û rêbazên cuda hatin pêşniyazkirin, dîsa bi awayekî pir zelal derket holê ku divê civîna bi vî rengî yên spesîfîk zêdetir werin lidarxistin û her qad di nav xwe de xebatên qadî jî pêk bînin û xebatan bi awayekî berfirehtir bidomînin.

Li gel vê divêtiyê, Lijneya Biryaran û Nîşegiran a ku di destpêka komcivîna de hatibû pêkanî di dawîya civînê de hewl da ku pirsgerêk û pêşniyazên hevpar ên hemû maseyan di raporeke giştî de bike yek û wek karên sereke yên ku divê Tor bike pêşniyazî Lijneya Şêwrê û Sekreteriyaya Torê bike da ku di karnameya xwe de bi cih bikin.

Hinek xalên hevpar ên sereke yên ku li maseyan hatibûn destnîşankirin li jêr hatine pêşkeşkirin:

### **Xalên Hevpar ên Maseyan**

\* Parçebûna bi her awayî ya Kurdistan û cih û warên Kurdistan wisa dike ku di hemû xebatan de li gor vê parçebûnê bernameyên cuda werin amadekirin. Muxatabên her xebata ku dê bê kirin divê di destpêkê de werin diyarkirin, gelo ka dê “Kurdên li çar aliyê cîhanê bin?”, “Kurdên li bakurê Kurdistanê bin?”<sup>3</sup>, “Kurdên li bajarên din ên Tirkîyeyê dijîn jî dê di nav de bin?” û hwd. Ji

3 Mebest ji “bakurê Kurdistanê” ew erdnîgariya ye ku îro di qadên resmî de wek başûrê rojhilatê Tirkîyeyê derdikeve.

bo xebateke zimanî û çandî jî divê wek armanc qadek were diyarkirin. Ji bo xebatên ku dê Tor ji bo niha bike jî wek muxatabên vê xebatê Kurdên li bakurê Kurdistanê û li Tirkiyeyê dijîn hatine destnîşankirin.

\* Her çi qas ji bo hemû beşdaran rêya herî kurt a ji bo çareserkirina hemû pirsgirêkan ‘dewletbûn’ an jî ‘xwedîstatûbûn’ be jî, tu beşdarek ji dewlet û statûya heyî hêvîdar nîn bû û ji bo çareseriyê ‘vegera li xwe’, ‘vedîtina şiyana xwe ya cewherî’ wek tekane rê hat dîtin.

\* Wek gelek caran, girîngiya bikaranîna zimanê Kurdî û jiyîna bi çanda Kurdî ya siyasetmedarên Kurd û xwedîderketina wan a li Kurdî ji aliyê beşdaran ve hat vegotin. Lê vê carê, dîtina rêyên çareseriyê li benda saziya siyasetê nehat hiştin; ji saziya siyasetê hat xwestin ku rê û rêbazên ku dê ji aliyê pisporên qadî ve werin diyarkirin, bisepînin. Ji bo vê yekê jî xala herî girîng ew e ku divê saziya siyasetê ziman û çandê wek “alavên siyasî” nebîne, wek ‘heyînen xweser û xwereng ên jiyani’ binirxîne.

\* Ji bo ku di xebatên qadî de bi hêza herî kêm jî sûda herî zêde were wergirtin, hevparî û hevkarî di xebatan de xurtir bibe, divê Tor rola xwe ya koordînekirinê baş bileyze.

\* Li gel ku gelek kar tên kirin jî, ji ber ku planeke giştî nayê saz kirin û karnameyên mehane, salane, 10 salane, hwd ên qadî nayên amadekirin, gelek caran xebat nagihîjin armanca xwe. Ji ber vê yekê jî, di serî de ji bo perwerdehiya bi Kurdî, divê hemû qad planên xwe yê giştî saz bikin û karnameyên xwe amade bikin.

\* Berî her tiştî, ji bo ku gelê Kurd ji xwebişaftinê û bişaftinê rizgar bibe; xwenasî, xwehezî, xweberzî lazim e. Ji bo vê yekê jî divê xebatên ku dê bandorên pozîtîf li ser ruhiyeta civakê bikin, bên kirin.

\* Li gel ku hêvî û daxwazên giştî yê kesên netewperwer hevpar in jî, gelek caran hinek cudakariyên biçûk dibin sedema cudabûn, lawazbûnan. Ji ber vê yekê jî li gel bi her awayî cihêrengiya fikr û bîrdoziyên kesên jî, divê piştevanî û palpiştiya di navbera kesên Kurdîhez û Kurdperwer de bê xurtkirin û hemû armanc li berjewendiyên neteweyî yê giştî werin edilandin.

\* Di serî de xebatên zimanî û çandî yê ku ji aliyê Kurdan ve heta niha hatine kirin, divê hemû ezmûnên gelên cîhanê yê ku rewşa wan dişibe rewşa Kurdan werin lêkolînkirin, tomarkirin û sûd ji wan were girtin.

\* Bi ked û têkoşînên giranbuha, heta niha gelek destkeftiyên Kurdan çêbûne. Divê Kurd bi her awayî xwedî li van destkeftiyan derkevin û her hewl bidin ku destkeftiyên zêdetir bi dest bixin. Xwedîderketineke xurt a giştî ya li destkeftiyên wek “dersên hîlbijartî”, “beşên Kurdî yê li zanîngehan”, “kursên

ku şaredariyên li metropolan vedikin” û hwd dê bike ku desthilatdar neçar bimînin deriyên nû li Kurdan vekin.

\* Divê navendeke wek ‘bîra Kurdan’ were avakirin û folklorê Kurdî tê de were komkirin; bi serperîştîya vê navendê kargehên çawaniya berhevkarîyê li hemû cihên ku Kurd lê dijîn, bi taybetî li herêmên çolter werin çêkirin û hemû keresteyên folklorî werin berhevkirin.

\* Divê xebateke berfireh li ser cih û warên ku navên wan hatine guherandin bê kirin, navên resen bîna tesbîtkirin û tomarkirin û ji bo ku ev navên resen bîna fermîkirin û bikaranîn ji divê serlêdanên hiqûqî bîna kirin.

\* Hemû xebatên ku tên kirin di wan de divê hewla fermîkirina Kurdî hebe û ji bo vê yekê jî divê her û her xebatên lobî û dîplomasiyê werin kirin.

\* Ji bo qutnebûna zarokên Kurdan ji zîman û çanda xwe, divê li hemû bajarên baxçeyên zarokan ên ku bi zîman û çanda Kurdî perwerdehiyê didin bîna teşwîqkirin û avakirin. Bi alîkarî û piştgiriya malbatên zarokên ku tên van baxçeyên zarokan divê daxwaz ji xwendegên taybet bîna kirin ku perwerdehiya bi zîmanê Kurdî di dibistanên xwe de bîna pêşîn an jî dibistanên azad werin vekirin.

\* Divê ji bo perwerdehiyê bîname û mufredat werin amadekirin û li gor mufredata ku hatiye amadekirin jî materyalên giştî werin amadekirin. Ji bo vê yekê jî divê gelek komxebat û kargeh werin lidarxistin, li ser perwerdehiya navmalî, ya medreseyên Kurdan û ezmûnên cihanî lêkolîn werin kirin û teşeya dawîn a bîname, mufredat û materyalan li gor wan ezmûnan were dayîn.

\* Divê hemû mase xebatên pisporî yê qadî bikin, li ser têgihên qadî komxebatan çêbikin û ferheng û ferhengokan amade bikin.

\* Di serî de ji bo zarokan, ji bo hemû qadên jiyane divê derxistina kovaran were teşwîqkirin, kovarên heyî yê wêjeyî, folklorîk, çandî, hunerî, rexneyî, derûnî, aborî û hwd werin xurtkirin.

\* Divê lêkolînek derbarê bikaranîna mafê perwerdehiya zîmanê dayîkê de were kirin ka di mewzûatên navxweyî û navneteweyî de çawa ye û raporek were amadekirin.

\* Her çî qas ji aliyê dewletê ve gav neyên avêtin û rê li her derê li pêşîya Kurdî were girtin jî, divê şîrketên taybet ên ku di hemû qadên jiyane de dixebitin bi hişmendîya gel û kampanyayên sîvîl bîna neçarkirin ku Kurdî û Kurdîzanan di avaniyên xwe de bi cih bikin. Ji bo vê yekê jî di serî de operatorên GSMyan, şîrketên balafiran, nexweşxaneyên taybet, zincîremarket û hwd divê bîna teşwîqkirin ku li cihên ku Kurd lê dijîn xizmetên bi Kurdî jî bikin û xebatkarên Kurdîzan bigirin kar.

\* Ji bo xurtkirina têkiliyên bi gelên din re, ji bo xebatên hevnasîna û dîplo-

masiyê û ji bo afirandina derfetan ji bo ziman û çanda Kurdî, divê proje bên amadekirin û ji saziyên navneteweyî re bên pêşkêşkirin.

\* Ji bo ku di hemû pêvajoyên hemû xebatan de têkiliya bi gel re her zindî bimîne, xebat pêkve bimeşe, rewş baş bê zanîn û bi her awayî armanc hasil bibe, divê xebatên rapirsînê bên kirin.

\* Bernameyên fêrkirina Kurdî werin amadekirin û weşandin. Televîzyonên heyî yê Kurdan naverokên xwe xurtir bikin. Divê Zarok TV were xurtkirin, bernameyên ku çand û kevneşopiya Kurdan bo zarokan veguhêzin zêdetir werin amadekirin.

\* Di serî de medyaya civakî, divê teknoloji baş bê bikaranîn. Aplîkasyonên fêrkirina ziman werin amadekirin, bikaranîna wan were teşwîqkirin. Kanalên çandî û hunerî yê li ser înternetê werin vekirin û danasîna wan baş bê kirin.

\* Bi taybetî xebatên wêjeyî û ramanî, divê di hemû xebatan de rewşa girtiyên û girtîgehan li ber çavan were girtin û plansaziye xebatan li wê gorê werin kirin.

\* Divê di encama gelek kargeh û komxebatan de saziyeke wergerê were amadekirin û ev sazî di serî de wergerandina berhemên klasîk ên cîhanê, serperîştîya gelek karên girîng ên bi vî rengî bike.

\* Ji bo ku Kurd hev baştir nas bikin û ji hev têbigihên, di serî de berhemên wêjeyî, divê hemû berhemên girîng li hemû zaravayên Kurdî werin anîn, Kurd hem alfabe ya latînî û hem jî alfabe ya aramî hîn bibin û berhemên hev bixwînin.

\* Di serî de berhemên çandî, hunerî û wêjeyî, divê mafê telîfê yê hemû berhemên Kurdî û Kurdewar were parastin, ji bo danasîna van berheman xebatên berfireh werin kirin.

\* Divê her saleke nû bi navê keseyetekî/e girîng ê/a Kurd were binavkirin, li ser wê/wî sempozyûm, panel, semîner werin lidarxistin, xebatên zanistî werin kirin, bên çapkirin.

\* Wêjeya Kurdî ya nûjen her sal û roj bi gelek berhemên nû hinekî din dewlemendtir dibe. Ji bo danasîn û teşwîqkirinê divê her sal ji aliyê saziyeke neteweyî ve xelatên wêjeyî werin dayîn.

Ji bilî van xalên hevpar ên sereke, her maseyek ji bo xebatên xwereng ên navxweyî arîşe û kêşeyên xwe yê ku destnîşan kiribûn û rê û rêbazên çareserîya van kêşe û arîşeyên xwereng ên ku destnîşan kiribûn dê ragihînin kes û saziyên têkildarî qada xwe. Maseyan ji bo sepandina rê û rêbazên çareseriyên pirsgerêkan ên ku hatine pêşniyazkirin karnameyek danîn ber xwe û ji bo ku torên qadî yê taybet xurtir bikin û van karnameyan bi awayê herî berfi-

reh bisepînin biryar dan. Li gel ku gelek xalên hevpar ku li jorê hatine nivîsandin li ser hemû maseyan hebûn jî, ji bo ku neheqiyek li maseyan nebe yan jî ji ber ku ne pêkan e ku mirov bizane ka kîjan mase dê zêdetir xwedî li van tesbît û rêyên çareseriyên derkeve û bi awayekî berfirehtir bisepîne, hinek tesbît û pêşniyazên ku dubare hatine gotin, dubare di maseyên cuda de hatine nivîsandin. Bersivên pirsên “Çi?” û “Çima?”yê yê ku li ser van maseyan hatibûn dayîn ev in:

### **Maseya Nivîskaran**

\* Civaka klasîk belav bûye û êdî civaka Kurd bi awayekî xwezayî nikare vî zimanê biparêze.

\* Astengiya herî mezin a li pêşiya Kurdî nebûna statûyekê ye.

\* Nivîskarî wek xebateke manewî tê dîtin û kirin.

\* Bandora zimanên biyanî li ser nêrîn, ruhiyet û tama wêjeyê û nivîskariya Kurdî heye.

\* Têkiliya Kurdî ya bi dema modern re di wê de pirsgirêk heye.

\* Qada nivîskariyê hinekî elît e.

\* Di gelek waran de qalib û forma zimanekî din li ser Kurdî tê ferzkirin.

\* Em dixwazin ku xwe bi serdestan bidin hezkirin.

\* Di tevahiya cîhanê de çîna navîn xwendevan in, çîna navîn a Kurdan bi Kurdî kêr dixwînin.

\* Pirsgirêka sereke ya Kurdî bişaftin e.

\* Zimanê çapemeniya Kurdî di bin bandora zimanên din de teşe girtiye.

\* Asoya ku di gelek berhemên Kurdî de tê afirandin ne Kurdî/Kurdewar e.

\* Muxatabên nivîsa Kurdî ummî ne, xwende nîn in. Bi xwendinê nizanin.

\* Nivîskarî bêhtir bi refleksa parastina zimanê kirin.

\* Ruh û hestiyariya bi têkiliya ziman, dîrok û çanda Kurdî ya jinan xurtir e, lê kêr dinivîsin.

\* Habîyata gel û ziman hatiye guhertin. Li gor jiyana nû zimanê heyî qels e. Peywira me ew e ku em vî zimanî rakin ser pêyan û kirasekî nû lê bikin.

\* Zimanê me wek zimanê nezanî û xizaniyê hatiye diyarkirin.

\* Têkiliya me û zimanê Tirkî ne asayî ye, têkiliyêke hiyerarşik heye. Tirkî kujera Kurdî ye, divê gel xwe ji atmosfera Tirkî rizgar bike.

\* Zimanê bazar û perwerdehiyê divê bibe Kurdî.

\* Heger çîroka her zimanî hebe, divê em bi çîroka Kurdî bizanin.

- \* Divê nivîskarên Kurd mîrateyên Kurdî binirxînin, bixwînin.
- \* Divê ferhengên berhevkarîyê werin amadekirin.
- \* Berhemên soranî divê werin latînîzekirin.
- \* Divê em baş bi çîroka Kurdî bizanin û li çîroka nûjen werînin.
- \* Divê aqil û ruhiyet bi hev re bimeşin.
- \* Divê ev sal (2020) ji bo Baba Tahirê Hemedanî were terxankirin û li serê gelek xebat bîn kirin, bikeve rojeva Kurdan û her salek bi navê kesekî/ê were pêşwazîkirin û xebat werin kirin.
- \* Divê Tor hewl bide ku xwendevanên wêjeya Kurdî zêde bike.
- \* Divê xelatên wêjeyê werin dayîn.
- \* Divê nivîskar jî birêxistin bibin.
- \* Divê wergera Kurdî ya berhemên klasîk ên cîhanê were kirin.
- \* Divê nivîskar, weşanger û xebatkarên çandê bi hev re komxebatan bikin.
- \* Divê di wêjeya zarok û ciwanan de xebat werin kirin. Bi saziyên perwerdehî û zarokan re hevkarî dikare were kirin.
- \* Ji bo çapa pirtûkan divê hewla danîna têkiliya bi dewletê re were dayîn. Ev tişt ji bo bidestxistina statûyê jî girîng e.
- \* Rewşa nivîskarên di zindanan de divê di hemû kar û baran de li ber çavan were girtin.
- \* Divê ji bo Kurdên ku bi Tirkî dinivîsin bang bê kirin da ku bi Kurdî binivîsin.
- \* Divê hevkarî di navbera nivîskar, weşanger, saziyên perwerdehiyê û hwd de hebe.
- \* Divê pirsgirêka telîfê ya nivîskaran were çareserkirin.
- \* Divê kargehên nivîskariyê werin lidarxistin.
- \* Her endamek 100 pirtûkên xwe bigihînin Torê û Tor jî bike ku serê malê 2 pirtûkên Kurdî hebin.
- \* Divê însiyatîfeke ji derveyî siyasetê ya ku bandorê li hemû qadan bike were avakirin.
- \* Ji bo azadiya zimên divê gel azad be. Ji bo ku ji ziman re statûyek hebe, divê ji gel re jî statûyek hebe.
- \* Tor divê rêxistineke *de facto* be, ne fermî be.
- \* Ji bo afirandina hişmendiyekê xebateke navxweyî bê kirin.
- \* Hiqûqeke bihevrejîyan û bihevrexebatê divê were diyarkirin.
- \* Tor divê ji bo nivîskar û weşangeran beşeke xweser ava bike.
- \* Tor têkiliyên nav welêt û diasporayê birêxistin bike.
- \* Divê mehê mijarek were hilbijartin û nîqaş û gengeşî li ser wê werin kirin.
- \* Divê Tor pîvan û hişmendiyê diyar bike û bi rêya saziyan karê pratîk were kirin.

\* Divê xebat li cihekî tenê neyên kirin, li tevahiya cih û warên ku Kurd lê dijîn werin berbelavkirin.

\* Divê derfetên aborî werin dîtin.

\* Divê karnameya salane ji bo her qadê were derxistin.

\* Divê ji bo rêgirtina li bişaftinê xebatên giştî yê hevpar werin kirin.

\* Komîsyonek were avakirin ku standardîzasyonê çêbike û bibe otorîte û ji bo hemû qada nivîsê diyarker be.

\* Divê têkiliyên navxweyî û navneteweyî bîn xurtkirin.

\* Divê em li gotinên zayendperest baldar bin, em xwe ji wan rizgar bikin.

\* Divê piştgiriyeke bêhtir were dayîn ji bo kirmanckî.

\* Divê Kurdî wek taybetiyeke erênî ji bo peydekirina kar bê dîtin.

\* Divê hiqûqeke navxweyî ya bi hev re jiyane û bi hev re xebatê ya xurt were avakirin.

\* Divê em ziman li ser axekê pêname bikin. Kêşeya Kurdî kêşeya welêt e. Heger kêşeya statûyê were çareserkirin, dê kêşeya ziman jî were çareserkirin.

\* Divê Tor ji salonan derkeve û kolanan ji xwe re bike armanc.

\* Divê Tor ji bo Kurdan û Kurdî saziyan veke (saziya wergerê, ya rexneyê û hwd).

\* Têkilî divê bi siyasetê, weqfên wek Mezopotamya û Beşikçi re were danîn.

\* Tora Ziman û Çanda Kurdî hewldaneke siyasî ye, li ser zemîna zimên siyasetê xwe dike.

\* Divê qada rewşenbîrî jî wek qada siyasetê li pêş be, bikare di gelek waran de ji siyasetê re rênîşander be. Ev xebat ne li derveyî siyasetê ye, ne li dijî siyasetê ye.

## **Maseya Weşangeran**

\* Wek weşangerên Kurd 15 kes beşdarî vê xebatê bûn. Mijarên ku gengeş li ser wan hatin kirin ev in: (1) Belavkarî (pêşangeh, pirtûkxane, firotin, standina pirtûkan ji aliyê dewletê ve), (2) Telîf (têkiliya weşanxane û nivîskaran), sponsorî, referansên siyaset û beşên din ên civakê, (3) Beşên weşangeriyê (beşên taybet, zarok û hwd), (4) Yekîtiya weşangeran û organîzasyonên bingehîn ên têkiliya civak û weşangeriyê, (5) Çapxane, (6) Edîtorî, redaksiyon, teshîh û hwd, (7) Pergala xelatdayînan û teşwîqkirina nûnivîskaran

\* Problema herî mezin ew e ku çanda pirtûkxwendinê tune ye. Rewşenbîriya Kurdî gelek qels e. Siyasetmedar qet pirtûkên Kurdî naxwînin, naaxivin, qîmetê nadin Kurdî. Çi siyasetmedar, çi hunermend, kesên bijare qîmetê nadin Kurdî û xwedî lê dernakevin.



\* Qadên xwendinê yên pirtûkan gelek kêr in, divê bîn vekirin. Weşanxaneyên bajarên Kurdistan nikarin xwe bigihînin metropolên Tirkîyeyê, yên li metropolên Tirkîyeyê nikarin xwe bigihînin herêm û bajarên Kurdistan.

\* Siyaseta Kurdistan di vê qadê de gelek qels e. Di vir de hem li ser vê rewşê û hem jî li ser têkiliyên peywîrên dewletê divê hewldanan bide û bîne rojeva meclîsê siyasetê. Şaredariyên bajarên Kurdistan ev awa her tim paşguh kirine û piştî qeyûman jî ev qad vala maye.

\* Navendên firotina pirtûkan kêr in.

\* Yek ji problemên herî mezin danasîn û reklama berhem û weşanên Kurdî ye. TV, radyo, rojname û weşanên komunîkasyonê di vî warî de lawaz in, li ser nasekinin.

\* Saziyeke belavkar a Kurdistan tune ye, ev valahiyeke mezin e, divê çareser bibe.

\* Pirtûkfiroşên Kurdistan lawaz in, yên Tirkan jî hin ji wan nakin, hin ji wan jî ditirsin.

\* Rêya beşdariya pêşaneyan li weşangeran girtî ye.

\* Dorpêçkirina aborî ya dewletê li ser weşangeran heye. Dewlet nahêle bazara Kurdî geş bibe.

\* Buhayê pirtûkan zêde ne, xwendevan gazinan dikin, lê ji ber ku tîraj hindik e, ev jî malîyetê giran dike û buhayê pirtûkan zêde dibe.

\* Pêwîstî bi çapxaneyê li bajarekî Kurdistan heye.

\* Di pêşketina weşangeriya Kurdî de sponsorî divê.

\* Sazî û dezgehên Kurdistan divê endamên xwe agahdar bikin ji bo standina pirtûkan.

\* Karê weşangeriyê aliyekî wê heye ku ew jî bazirganî ye.

\* Divê perwerdehiya bi zîmanê Kurdî bikeve rojevê, ev dikare xwendina Kurdî bi pêş bixe.

\* Pirtûkên Kurdî nagihîjin gel, tenê nivîskar û yên eleqedar peyda dikin, dixwînin.

\* Redaksiyon û edîtoriya pirtûkên Kurdî lawaz e, divê kargeh bîn çêkirin an jî perwerdehiya bê dayîn/dîtin.

\* Ji aliyê hiqûqnasan ve komîsyon bê avakirin û ev komîsyon pirsgerêkên hiqûqa weşangeriyê bişopîne.

\* Divê standardîzasyona rastnivîsê bê kirin û ev zelal bibe. Her weşanxane bi serê xwe xwedî rêbaz û rêgezan e.

\* Di weşangeriya Kurdî de problema zaravayan heye. Hin zarava xwedî dijawantajan in, divê di vî warî de hişmendiya cudakariya erênî ya ji bo zaravayên dijawantaj bê bipêşxistin. Dewlet bi zanîn di vî warî de polîtîkayan bi pêş dixê.

\* Li zindanan berhemdarî heye, lê ev nagihîje derve, çap nabin, xebat divê bên kirin. Divê lêxwedîderketin hebe. Divê weşanger li nivîskarên zindanan xwedî derkevin.

\* Bi lez û bez divê folklorê berdest û nigan bê berhevkerin û bê fînansekerin û bê çapkirin. Çimkî ziman piştî xwe dide folklorê.

\* Weşangerên Kurd di sala 2011an de koordînasyonek ava kiriye; ev koordînasyon ji niha û bi şûn de di warê qada Tora Ziman û Çanda Kurdî de jî dê xebatên xwe bidomîne.

\* Ji bo avakirina kooperatîfê nîqaş hat kirin, dê ev nîqaş di civînên bê de bê biencamkirin.

### **Maseya Çandê**

\* Çand serpêhatiya hemû aliyên jiyânî ye ku bingeha wê mîras e. Heger xwedî hebe û berdewam bibe, dibe mîras; bê xwedî be, dibe mîrate, dibe malê talanê. Yê ku em ji talanê xilas bikin û biparêzin dibin *mîrata çandî*.

\* Ev mîrateya çandî keftûlefteke jiyânî ya hevpare. Kevneşopî û folklor hostayê kar û keftûletê ne, endezyariya hizr û ramanên hevpar dikin, pê teşe didin çandê û bi awayekî hunerî wê li hev tînin û bi nasname dikin.

\* Çand bi kevneşopî û folklorê tê meyndin û di encamê de nasnameya neteweyî pê ava dibe.

\* Ziman, hizr, mît û folklor kiras e ku li bejna “neteweyê” tê.

\* Navenda bîra çanda Kurdî were vekirin û materyalên ku hatine berhevkerin bi rêbazeke baş bê parastin û bi awayekî teknolojîk bê belavkirin.

\* Bi taybetî berhemên bi zanistî hatine hilbijartin bi rêbazeke baş û pedagojîk ji bo zarokan bên amadekirin û belavkirin.

\* Ji bo sazkerin û bingehên xabatên ku me li jor behs kirin, dam û dezgeh bên avakirin.

\* Zimanê gilî û gazindê divê bê terikandin, giranî bi hizr û ramanan bê dayîn û pêşiya qirkerinê bê girtin

\* Divê çanda Kurdewarî bibe pêdiviyek.

\* Ji bo pêşxistina çandê divê siyaseta ji xwe dest pê bike û xwe tê de bike.

\* Li ser muzîka Kurdî divê xebatên akademîk bên pêşxistin.

\* Li ser çandê divê pergala venêrînê hebe, giraniya nêrîna wan a pisporî li ser sazî û siyaseta be.

\* Xebat ji bo zarokan bên kirin ji bo ku em bikarin mîrasa heyî veguhezînin nifşên nû.

\* Divê demildest xebat bên destpêkirin ku bê têkçûnî xwe bigihînin serkaniya berhevkarîyê.

\* Bi rêya Torê handanek bê dayîn ku torek di navbera berhevkaran de bê ava kirin ku xwe bigihînin serçaveya berhevkarîyê.

\* Berhevkar û arşîvkar bêne gihandin.

\* Komkirina arşîveke neteweyî û arşîvkariyeke zanistî ji bo dabeşkirinê da ku gel xwe zû bikare bigihîne materyalên berhevkarîyê.

\* Xebatên berhevkarîyê yên ku hatine kirin divê bi awayekî zanistî kar li ser bê kirin.

\* Divê Tor xizmeta wê yekê bike ku berhemên çandî berdestî gel bibin, mekan û rêbazên teşhîrê ji hemû beşên çandê re bî amadekirin.

\* Xabateke ku berê ku wekî “Navenda Lêkolînên Folklorê” plansaziya wê ji aliyê sazî û dezgehên Kurdan ve hatibû kirin, lê bê encam mabû, careke din Tora Ziman û Çanda Kurdî li vê projeyê vegere û ji bo pêkanîna wê hewl bide.

\* Ji bo raya navneteweyî divê hindek proje ji bo saziyên navneteweyî (wekî Unesco, YN û hwd) bê amadekirin.

\* Ji bo peydakirina fonan û danasînê Tora Ziman û Çanda Kurdî pêngavên dîplomatîk bî destpêkirin.

\* Tora Ziman û Çanda Kurdî divê bi sazî û dezgehên Kurdan ên li diasporayê re jî pêwendiyên xwe xurt bike û hevkarîyê bi wan re bike.

\* Wekî mafê çandî yê rewa daxwaz ji dewletê jî bê kirin.

\* Perwerdekirina zarokan li nav dibistanên dewletê bê teşwîqkirin.

\* Ji bo dersdayîna muzîkê ji bo zarokan divê bi metodolojiyeke pedagojîk ji polên destpêkê heta dawî ders bî dayîn.

\* Divê li hemî balafirgeh û rawestgehan anons bi Kurdî bî kirin û ev yek ji dewletê bê xwestin.

\* Çap û weşan divê bi hemî zaravayan bê pêkanîn.

\* Me li jor behsa gelek xalan kir ku berhevkar berhemên xwe bidin kogeh an saziyan, lê bi her awayê divê mafê jêder û berhevkaran bê parastin. Şertên mafê telîfê tev de bî pêkanîn. Rê li pêşiya hunerdiziyê bê girtin.

\* Pêşniyara me ew e ku Tora Ziman û Çanda Kurdî bibe saziyek ku bikare van hemî xebatan pêk bîne!

## **Maseya Hunerê**

\* Asîmîlasyon bi awayên cuda li ser Kurdan tê meşandin û encamên vê asîmîlasyonê bandorê li ser afirandinên hunera Kurdî (şano, muzîk, wênepeyker, sînema, govend-reqs û hwd) jî dike.

\* Hunermend, dema ku hunera xwe bi Kurdî pêşkêş dikin, şanoya xwe bi Kurdî pêşkêş dikin, muzîkjen muzîka xwe bi Kurdî îcra dikin, sînameger filmên xwe bi Kurdî çêdikin, lê mixabin Kurdî di jiyana hunermendên Kurd de pir qels e û cih nagire. Gelek hunermend, qaliban, diyalogan, stranan bi Kurdî ji ber dikin lê mixabin kêliyeke jiyana xwe jî bi Kurdî najîn.

\* Huner di veguherîna civakan de roleke sereke û diyarker dileyîze, lewma hilberînên hunera Kurdî dikare heta astekê rê li pêşiya polîtîkayên asîmîlasyonê bigire, lê mixabin di rewşa heyî de hilberînên hunera Kurdî di vî warî de pir lawaz dimînin.

\* Huner û hunermendiya Kurdî mixabin xwe bi awayekî pir xurt nikarin bigihînin hemû şaneyên civakê. Gelek sedemên vê yeke hene, lê yek ji wan sedeman polîtîkayên bişaftinê yên dewletê ye, ya din jî ezezî û popîlîzm û bêxemiya hunermendan e li hember guhertin û veguhertina civakê.

\* Di warê geşkirin û parastina ziman û çanda Kurdî de rol û risteke pir giran dikeve ser milê hunera Kurdî lê divê hemû fikrên cuda yên siyaseta Kurd û siyasatmedarên Kurd di warê parastin û bipêşxistina ziman û çanda Kurdî de bikaranîna Kurdî esas bigirin.

\* Mirov dikare bi rêya TVyan xwe bigehîne gel lê em zêde ji vê yekê sûdê nagirin. Mixabin di kanalên Kurdî de zêdetir bernamêyên siyasî hene û hunera Kurdî ya alternatîf a ku dikare civakê ji nû ve ava bike xwe nagihîne gel.

\* Wekî ku pêşiyên me gotine, “her giya li ser koka xwe şîn dibe” eger ku zarokekî hîn di zikê dêya xwe de dengê Şakiro û Meryem Xanan nebihîstibe, helbestên Melayê Cizîrî û Ehmedê Xanî, çîrok û çîrvanokên Kurdî nebihîstibe, eger ku zarokek di zikê dêya xwe de bi dengê meya Egîdê Cimo û bi tîlên biska Mihemed Şêxo nelerizîbe, wê ev giya tu carî li ser koka xwe şîn nebe.

\* Prestîja zimanê Kurdî her ku diçe kêm dibe û encamên wê di hunerê de jî derdikevin holê. Li dijî vê yekê, hilberînên hunerî yên serkeftî dikarin prestîja Kurdî bilind bikin.

\* Wergêr her çend di warê teknîkî de cerebeyan bi xwe re bîne jî, di rastiyê de wate û ruhê hunerê dikuje. Ji ber vê yekê jî berhemên bê kok tîn çêkin.

\* Rexnegiriya hunera Kurdî pir lawaz e û ev yek rê li ber pêşketina afirandinên hunerî yên Kurdî digire.

\* Dejenerasyona çand û hunera Kurdî hatiye normalîzekirin. Tiştên ku divê me şoq bikin, di jiyana me de hatine normalîzekirin. Gelek tiştên komformîzma modernîzmê jiyana Kurdevar dejenere kiriye.

\* Bernamêyên çandî û hunerî di bin siya siyasatê de difetisin.

\* Desteserkirina rêveberiyên xwecihî bandorê li hemû qadên jiyane kir.

Lê hunera Kurdî bi karakterê xwe yê berxwedêr, nesekinî û berhemdarî domand. Vê yekê bi xwe re însiyatîfên nû yên hunerî jî afirandî.

\* Divê kesên ku organîzasyonên bi Kurdî li dar dixin kalîteya xebatên xwe baştir bikin. Divê afirandina hunerî bi aboriyê ve neyê girêdan.

\* Eger stranek, şanoyek, filmek, wêneyek û peykerek an jî filmekî kartonî bi giyanekî Kurdewar bikare xwe bigihîne zarokan, ew ê derbeke pir mezin li bişaftinê bixe.

\* Huner û hunermend divê bandorê li siyasetê bikin û di rêya avakirina yekîtiya neteweyî de rolekê bileyîzin.

\* Nîqaşkirina mijarên civakî, çêkirina forûmên çandî û hunerî dê bandoreke pozîtîf li ser ruhiyeta civakê bike.

\* Kanalên ku bi Kurdî hunerê pêşkêş dikin divê naveroka wan a hunerî bîn xurtkirin, pîvanên çand û hunera Kurdî yên resen bîn esasgirtin.

\* Perwerdehiya hemû beşên hunera Kurdî divê bi îsrar bi zaravayên Kurdî bê kirin.

\* Divê siyaseta Kurd ji bo parastin û bipêşxistina hunera Kurdî stratejîk tevbigere, meseleya zimanê wek meseleyeke sereke û esas bibîne û ji bo berbelavbûna zimanê derfetan biafirîne.

\* Di bername û çalakiyên hunerî de, divê siyasetmedarên ku bi Kurdî dikarin xwe îfade bikin, biaxivin.

\* Hunermend û saziyên ku karên hunerî dikin, divê di hesabên xwe yên medyaya civakî de zaravayên Kurdî bi kar bînin.

\* Divê kanalên TVyê yên Kurdî di bernameyên xwe de danasîna berhem û hunermendên Kurd ên ku bûne mîrateya civakî, yên dijîn û hunera pratîk îcra dikin jî bidin nasîn.

\* Divê çapemeniya Kurdî bi nêrîneke hevpar û erênî li hunera Kurdî binêre û berhemên hunera Kurdî bigihîne gel.

\* Divê hunermendên Kurd ên xwedî fikrên cuda, zêdetir bîn cem hev, têkiliya di navbera wan de bê xurtkirin û piştevanî û palpiştiya di navbera wan de bê zêdekirin.

### **Maseya Ziman û Perwerdeyê**

\* Divê plan, plansazî û bernameya ziman û çandê ya Kurdan hebe. Di binê vê plansaziyê de divê kar û peywîrên sazî û dezgehên Kurdan bîn diyarkirin û plan, plansazî û bernameyên wan li gorî vê plana giştî bin. Qada ziman û perwerdehiyê jî divê plan, plansazî û bernameya xwe li gorî vê yekê amede bike. Yek ji sedemên bişaftin û biserneketinê ev e.

\* Ji bo ku em bikarin fam bikin ka rêjeya bişaftinê çi ye, gelê me û saziyên me li ser zîmanî çi difikirin, divê em lêkolîn û anketên girîng çêbikin û rewşa xwe tehlîl bikin. Lewra em nîzanin rêjeya bişaftinê çawa ye û em li gorî texmînan diaxivin û karê xwe dikin.

\* Li ser hişmendiyê lêkolîn bîn çêkirin, heyetek bikare here welatên ku rewşa wan dişibe me û li wir li plan û plansazî û têkoşîna wan binihêre, çavdêriyan bike, raporekê amade bike; paşê li ser meseleya hişmendiyê konferanseke giştî bê çêkirin.

\* Di qada zîman û perwerdehiyê de yek ji kêmasiyên girîng jî kêmbûn û qelsbûna materyalan e. Materyal gelek jê ne nûjen in û ne pedagojîk in. Ji ber ku materyal tim divê hebin û bîn nûkirin lazim e em navenda avakirina materyalan ava bikin.

\* Divê hemû materyal û nivîsên Kurdan li gorî rastnivîsekê bin û termînolojiya wan yek be. Di vî warî de divê saziyên me bi yekdengî tevbigerin. Ji bo vê yeke divê saziyên me yên zîmanî û akademîk li hev bicivin.

\* Yek ji pirsgirêkên mezin pirsgirêka hişmendiyê ye. Di nav gel de hişmendiya zîmanî pir qels e. Xelk bi vê meseleyê pir danakeve û li ser wê xwedîzanî û agahiyan nîn e.

\* Di serî de siyaseta me û hemû saziyên me divê di nava xwe de dest bi xebatên hişmendiyê bikin. Eger mirov hişyar nebûbe, nikare însanan hişyar bike. Lazim e di vî warî de materyal hebin ku em bikarin li nava gel tevgera hişmendiyê bidin destpêkirin. Heger hişmendiya gel çênebe, daxwaza zîman dê qels be. Şano, sinema, huner ev war divê materyalên hişmendiyê amade bikin. Li ser ekranên televîzyonan ji bo vê yekê bernameyên domdar hebin. Li ser bişaftin û hişmendiyê tunebûna malperekê jî kêmasî ye.

\* Di warê perwerdekirina zarokan de îmkân û materyal kêman in. Televîzyonek têra zarokan nake, divê xêzefilmên balkêş û baş hebin. Zarok TVyê divê di meseleya bikaranîna zimên de baldartir be. Ji bo zarokan divê pêşdibistan û krêş bîn vekirin. Eger îmkân hebin divê saziya zarokan bê vekirin û bi taybetî li ser mijara zarokan be.

\* Ji vir û bi şûn de li ser navê Kurdan çi bê kirin, divê hemû derdorên Kurd tev li xebatan bibin.

\* Her sazî di warê xwe de her sal û her gav Kurdî teşwîq bike. Şaredarî, weşanxane û odayên sivîl bila ji bo xebatên Kurdî xelatan bidin.

\* Lazim e şaredariyên Kurdan, xizmeta xwe bi du zîmanan bikin.

\* Divê ev pêkhate bê xurtkirin, statûyeke wê hebe û xwedî navendekê be.

\* Lazim e hem di nava saziyên Kurdî de, hem di nava saziyên zîman û per-

werdehiyê de koordîsnasyoneke xurt hebe. Li hin bajarên Kurdistan sazîyên zimanî qet tune ne. Divê bên vekirin.

\* Yek ji qadên ku di bin xetereyê de ye û tune dibe folklor e. Ev war dibe ku heta pazdeh bîst salan ji meydanê rabe. Lazim e wekî karekî acîl em berhevkarîyê bikin, keresteyên xwe yên folklorî û rîtuêlên xwe tomar bikin.

\* Di warê Kurdî de yek ji qadên ku divê xebat bên kirin jî qada ferhengê ye, bi sedan ferhengokên biçûk ên çapkîrî hene û bi hezaran peyvên me neketine nava ferhengan û di nav zimanê devkî de mane. Neteweyên din vî karî wek karê herî lezgîn diyar kirine û ferhengên xwe berî her tiştî amade kirine. Em nizanin çend sed hezar peyvên me hene. Her ku kalek, pîrek dimire, bi dehan peyvên me bi wan re dimirin.

\* Divê di 21ê Sibatê û 15ê Gulanê de li ser zimanê Kurdî konferans û mîting bên çêkirin. Hemû sazî xebatên cur bi cur çêbikin.

\* Di her qadê de divê mamoste bên perwerdekirin. Bi tenê qada hînkirina zimanî têr nake. Divê di warê bîrkarî, muzîk, dîrok, edebiyat û erdnîgariyê de jî mamoste bên perwerdekirin.

\* Sazîyên perwerdehiyê yên li bajarên qet têr nakin. Gelek jê li navendê mane û taxên din nikarin bigihîjin wan. Bi taybetî li navçeyan ev xebat pir qels in, sazî tune ne.

\* Koma (maseya) zarokan û ya perwerdehî û zimanî divê bibin yek.

\* Ji bo xebat û materyal û keresteyên Kurdî divê cihê arşîvê hebe, navenda bîra Kurdistan hebe ku bikare bibe arşîv.

\* Her çî qas ji bo hînkirina ziman komeleyên cuda hatibin vekirin jî, divê saziyeke zimanî bê vekirin û hemû komele di bin banê wê sazîyê de bin. Ev sazî divê bê avakirin û bêhtir di warê akademîk û teorîk de xebatan bike, sazîyên din ên perwerdehî û zimanî organîze û koordîne bike.

\* Ji bo perwerdehiya alternatîf konferansek bê çêkirin û rê û rêbaz û model bên nîqaşkirin û ji bo Kurdî perwerdehiyeke alternatîf bê çêkirin.

\* Ji bo dibistanên azad îmkan bên çêkirin û li her bajarî bên vekirin.

\* Karên zimanî û çandî karên hemû sazîyên Kurdistan in, divê hemû sazî xwe bidin ber vî barî.

### **Maseya Odeyên Pîşeyî û Sendîkayan**

\* Divê sazî xebatên xwe pirzimanî bikin.

\* Divê sazî di medyaya civakî de Kurdî jî bi kar bînin.

\* Divê sazî û dezgehên pîşeyî ji bo ku hişmendiya Kurdî di nav civakê de cih bigire, xebatên hişmendiyeke bimeşînin.

\* Her sazî divê li gorî beşa xwe li ser Kurdî xebatên zanistî bimeşîne û encamên wan xebatan bi raya giştî û saziyên navneteweyî re parve bike.

\* Divê her sazî ji bo perwerdehiya Kurdî ji endamên xwe re derfetan biafirîne.

\* Her sazî li gor pêdiviyê divê bi Kurdî materyalên dîtbarî amade bikin. Ev materyal ji bo endamên xwe yan jî ji bo civakê bin.

\* Hemû sazî di nav avahiya xwe de nivîsên tabela, afîş, derî û hwd bi du zîmanan çêbikin.

\* Hemû saziyên pîşeyî divê li ser têgehên xebatên zanistî bimeşînin. Ferheng û ferhengokan amade bikin.

\* Her sazî ji bo ku Kurdî bibe zîmanê fermî, xwedî sekn û gotinê be; bi saziyên din re xebatên hevpar bimeşîne

\* Dema ku rêveberiyên saziyan tînin avakirin, divê kesên ku bi Kurdî dizanin û xwediyê hişmendiya Kurdî ne esas bînin girtin.

\* Divê di navbera sazî û dezgehên pîşeyî de koordînasyoneke zîmanî bê avakirin.

\* Divê rêveberiyên saziyan, xebatên li ser zimên wek rojeva bingehîn bigirin dest. Lijneyên têkildarî xebatên zimên bînin avakirin.

\* Ji bo ku hişmendiya Kurdî di hemû saziyan de çêbibe, divê kanalên televîzyonê yên Kurdî her tim vekirî bin.

\* Hemû sazî ji bo rojên taybet ên zîmanê Kurdî bernamayan çêbikin û pî-rozbahiyan li dar bixin.

\* Ji bo ku hişmendiya Kurdî çêbibe, divê her sazî bi awayekî periyodîk xebatên zîman (film, şano, konser û hwd) li dar bixe.

### **Maseya Akademîsyen û Sosyolîngûstîkê**

\* Ji ber polîtîkayên asîmîlasyonê yên bi salan zîmanê Kurdî di bin xetereyê de ye, nîşana herî mezin jî ew e ku transfera zîmanî di nav nifşan de qut bûye û zarokên Kurd bi pîranî bi zîman û çanda Kurdî mezin nabin.

\* Cîvaka Kurd li Bakur êdî ne civakeke yekzîmanî ye lê civakeke pîrzîmanî ye; divê çareserî li ser vê rastiyê bê avakirin.

\* Divê gelê Kurd bi rastiya xwe bizane û biparêze, li ser vê hişmendiya jiyana xwe ava bike.

\* Ji bo çareseriyê, ne wekhevî lê pergaleke pîrzîmanî ya ku giraniya xwe dide zîmanê dayîkê lazim e.

\* Divê zîmanê Kurdî bibe xwediyê statûyeke fermî; bibe zîmanê perwerdehiyê û bibe zîmanê xizmetên cewawerî.



\* Ji bo vê yekê jî Kurdayetiyeke xurt, pilansaziyeke giştî ya ji bo 5, 10 û 20 salan divê.

\* Meselaya ziman meseleyeke psîkolînguîstîk e. Ji bo xurtkirina zimanê Kurdî, divê pîrestîja ziman bê xurtkirin û dîtbariya Kurdî di nav jiyane de belav bibe.

\* Transferkirina ziman û çanda Kurdî ya ji bo zarokan divê bibe armanca esasî ji bo hemû xebatên ziman û çanda Kurdî.

\* Divê şax, sazî û dezgehên Kurdan bikin ku qadên Kurdî zêde û xurtir bibin. Qadên ku herî zêde divê bal bê dayîn ev in:

- Qada malbatê
- Qada çand, huner û jiyana kêfxweşiyê
- Hemû sazî û dezgehên Kurdan, bi taybetî saziyên siyasetê
- Qada bazarê
- Qada perwerdehiyê

\* Hînkirina Kurdî pêdiviyeye lezgîn e, ji bo wê jî hemû derfetên heyî divê bîkaranîn. Wek mînak:

- Dersên hîlbijartî yên li dibistanan
- Qad û çavkaniyên sazî û dezgehên heyî

\* Ji bo hînkirina zimanê Kurdî û belavkirina çanda Kurdî divê amûrên teknolojîyê baştir bîkaranîn. Wek mînak:

- Aplîkasyonên telefonan
- Qanalên Youtubê
- Avakirina akademîyeke li ser Înternetê, hwd

\* Ezmûna başûr û rojavayê Kurdistanê çavkaniyên mezin in ji bo xurtkirin û zindîkirina ziman û çanda Kurdî. Lazim e ji van çavkaniyan bêhtir sûd were girtin û hevkarîyên ku ji sînoran derbas dikin bîkaranîn.

\* Xebatên ku li ser çand û zimanê Kurdî hatine kirin divê di bîreke/qadeke hevpar de bîkaranîn, bîreke kolektîf bê avakirin.

\* Zarokên ku Kurdî di nav malbatê de hîn nabin, gelek zahmet e ku li derve û piştî hîn bibin. Lê zimanê fermî û serdest bi her awayî hîn dibin. Divê bang malbatan bê kirin ku Kurdî bikin zimanê nav malê. Pirzimanî bi her awayî jî yekzimanîyê baştir e.

\* Derbarê sosyolînguîstîka Kurdî de agahiyên di destê akademîsyenan de kêmtir in. Lazim e bi her awayî xebatên lêkolînî bîkaranîn û daneyên sosyolînguîstîk bîkaranîn. Wek mînak di van mijarên li jêr de dikarin xebat werin kirin:

- Bikaranîna ziman li nav malbatê
- Hin sektorên popîler wek goga lîngan
- Rewşa zimanê Kurdî di nav xwendekarên zanîngehan de

\* Ji bo hemû qadan lazim e termînolojiyeke giştî û hevpar bê amadekirin.

\* Ji bo ku Kurdî bibe zimanê akademîyê, divê akademîsyenên Kurd pêşengiyê bikin.

\* Ji ber ku qada ziman û çanda Kurdî li zanîngehan teng bûye, divê di nav akademîsyen û sazî û dezgehên Kurdan de hevkarî bê xurtkirin.

\* Ji bo ku xebat û berhemên akademîsyenên Kurd bên parastin, lazim e raya giştî hin bêtir haydar be.

\* Lazime qada ziman û çanda Kurdan li zanîngehan bên firehkirin û zimanê Kurdî bibe zimanê hemû beşên lîsansê.

\* Divê hevkarîya di nav akademîsyenên Kurd de bê xurtkirin û ji bo vê yekê wekî gava yekem tora akademîsyenên Kurd bê avakirin.

\* Ji bo plansaziya sosyolîngûstîka Kurdî, divê bi awayekî baştir sûd ji ez-mûna gel û zimanên bindest bê girtin.

\* Kurmançî û kirmanckî her du jî di bin xetereyê de ne. Lê kirmanckî hîn bêhtir di bin xetereyê de ye. Divê sazî û dezgehên Kurdan zêdetir hêz û çavkaniyên xwe ji bo kirmanckî bi kar bînin.

\* Kurdî bi awayekî akademîk xurt dibe, lê di nav gel de qels dibe. Ji bo vê yekê, lazim e akademîsyenên Kurd, ji bo ku ziman û çanda Kurdî di nav civakê de geş bibe, bi malbat û gel re peywendiyê daynin û hevkarîyê bi sazî û dezgehên Kurdan re bikin.

### **Maseya Saziyên Hiqûq û Mafan**

\* Polîtîkayên yekperest ji aliye Komara Tirkiyeyê ve tîn sepandin.

\* Zimanê siyasî Tirkî ye û ev pirsgerêke sereke ye.

\* Berjewendiyên aborî û şexsî ketine pêşiya zimên.

\* Ji ber ku ziman nebûye zimanê perwerdehiyê, di civakê de di warê zimanî de hişmendiyek çênebûye

\* Ji ber ku Kurd bê statû ne, xwe di warê derûnî de bêxwedî dibînin. Ev yek jî di nav gel de bandora psîkolojiya bindestiyê zêdetir dike.

\* Di nav gel de ji axaftina Kurdî fedîkirin heye.

\* Bi bandora polîtîkayên bişaftinê di nav civakê de xwebişaftin derketiye holê.

\* Her çi qas hiqûqnasên Kurd di gelek waran de pêşengiya civakê kiribin jî, di aliye bikaranîna ziman û xebatên li ser zimanî de kêmane. Têkoşîneke birêxistin û rêkûpêk nemeşandine.

\* Divê baro û sazîyên maf û hiqûqê têkevin nav xebata ziman û çandê.

\* Divê li baroyên bajarên ku Kurd lê dijîn perwerdehiya zimanê Kurdî bê

dayîn.

\* Divê li ser mewzûata navxweyî û navneteweyî derbarê mafê perwerdeya zimanê dayikê de lêkolînek bê kirin û di vî warî de raporek bê amadekirin.

\* Divê ji bo serlêdanên mafê perwerdehiya bi zimanê dayikê alikarî were dayîn û şêwirmendî bê kirin.

\* Divê xebatek li ser herêmên ku navên wan hatine guhertin bê kirin û derbarê vê mijarê de serlêdanên hiqûqî bên kirin.

\* Divê hewl bê dayîn ku ji bo parastina bi zimanê dayikê ya di dadgehan de kesên di warê wergerê de pisporek in bikevin lîsteyên fermî.

### **Maseya Karsazan**

\* Sazgehên sivil rewşa ku sazgeh tê de ne li ber çavan digirin û bi vê vîzyonê dixebitin.

\* Sazgehên aboriyê divê Kurdî di hemû xebatên xwe de bi kar bînin. Karsaz hem ji bo rêveberiyên sazgehên ku cih digirin û hem jî ji bo kargehên xwe divê xebatkarên xwe perwerde bikin û amadekariya kampanyayan bikin.

\* Ji bo jiholêrakirina xetereya li ser zimanê Kurdî, divê di hemû warên jiyandê de ziman bê bikaranîn; li mal, dibistan, bazar û hwd.

\* Kanaleke televîzyonê ya li ser ziman û çanda Kurdî bê avakirin.

\* Xebatek li ser ferhenga têgihên aboriyê bê kirin û Maseya Karsazan ji bo vê xebatê pêşengiyê bike.

\* Ji bo ku zimanê Kurdî bibe zimanê fermî, gav bên avêtin. Endamên Maseya Karsazan ji bo vê mijarê alîkariya lobî û dîplomasiyê bikin.

\* Di xwendîgehên taybetb de perwerdehiya zimanê Kurdî bê dayîn. Endamên Maseya Karsazan dê pêşengiya vî karî bikin.

\* Ev xalên ku li jorê hatine gotin, çend beşên ji plansaziya zimanî ne. Hewce ye ku ev pêkhate plansaziyeke giştî û kolektîf amade bike.

### **Maseya Ragihandinê**

\* Rêjeya Kurdî di malbat û siyasetê de kêm dibe.

\* Divê perwerde bi Kurdî be, tenê perwerdehiya bi zimanê Kurdî hebe.

\* Bi zaravayê kirmanckî (zazakî) cihek tune ye rojnameger lê debara xwe bikin. Rojnamegerê tenê nikare bi kirmanckî debara xwe bike. Ev jî dike ku rojnameger ji wê qada kirmanckî dûr bikeve.

\* Rojnamegerên Kurd ji civata rojnamegerên cihanî dûr in. Divê rojnameger

salê carekê perwerdehiya rojnamegeriyê bistînin û guhdariya ezmûnên hev bikin.

\* Rojnameger di bin banê saziyan de kom dibin, divê rojnameger ne di xizmeta siyaseta saziya xwe de bin lê di xizmeta rojnamegerî û zimanî de bin.

\* Bandora zimanê medyayê li ser civakê heye, divê nûner û siyasatmedar jî bi zimanê Kurdî biaxivin. Divê rojnameger wan neçarî axaftina bi Kurdî bikin û ji bo daxuyaniyên bi zimanê Kurdî îsrar bikin.

\* Divê rojnameger ne bi tenê di karê xwepîşeyî de lê di têkilî û jiyana rojane de jî bi Kurdî biaxivin.

\* Medya dikare zimanan bide hînkirin, divê organên medyaya Kurdî hebin ku bi tenê perwerdehiya zimanê Kurdî bidin.

\* Civak li medyaya civakî jî dinihêre, divê medyaya Kurdî li tora civakî, li qadên wek Youtube, Facebook, Twitter, Instagram û hwd weşanên balkêş û xurt bike. Divê medyaya civakî jî bi zimanê Kurdî weşanê bike. Her wiha lazim e ku medyaya Kurdî li medyaya civakî jî piştgiriya kampanyayên ji bo zimanê Kurdî bike.

\* Zimanê medyaya Kurdî hişk e û ji civakê dûr e. Divê zimanê medyaya Kurdî were sivikirin.

\* Naveroka organên medyaya Kurdî xîtabî civaka giştî nake, divê berhemên wek rêzefilmên kêfxweşî û şahiyê jî bên çêkirin.

\* Divê bernameyên taybet ji bo zarokan hebin û divê bi van bernamayan çand û kevneşopiya Kurdan ji bo zarokan jî bê veguhastin.

\* Beşek ji civakê ji Kurdî şerm dike, divê medyaya Kurdî bi zelalî nîşan bide ku Kurdî cihê serbilindiyê ye. Wek mînak divê pedagog diyar bikin ku zarokên pîrzimanî ne kêmtir yê yekzimanî ne.

\* Nûçeyên Kurdî hindik tî xwendin, di heman saziyên Kurdan de kadroyên zimanê Kurdî ji kadroyên zimanên din kêmtir in, divê naveroka berhemên Kurdî bê xurtkirin û jimara kadroyên Kurdî bê zêdekirin.

\* Piraniya medyaya Kurdî nûçeyan bi zimanên din amade dike û werdigerîne Kurdî. Zimanê destpêkê anglo sereke yê malperên ajansên Kurdan divê Kurdî be û heger pêwîst be, ji Kurdî bo zimanên din divê bê wergerandin.

\* Divê di hemû nûçeyan de navê resen ên herêman bên nivisandin.

\* Divê pêkhatiya li civînê piştgiriya medyaya xwerû bi Kurdî bike.

\* Zarokên vî zemanî li înternetê dinihêrin, li sepanên telefonan dinihêrin, divê sepanên telefonan bi naverokên taybet ji bo zarokan û bi giştî ji bo mezinan bi Kurdî werin amadekirin.

\* Xebatên çandî û zimanî li navendên bajaran tînin kirin û nûçe jî li wan deran tînin çêkirin. Divê li gund û herêmên gundewar xebatên çandî û zimanî werin kirin û di medyaya Kurdî de cih bigirin.

\* Divê Kurdên ku li derveyê Tirkiyeyê dijîn jî beşdarî van xebatan bibin û ezmûn û teknîka xwe bi hev re parve bikin.

\* Divê qîmeta medyaya herêmî bê zanîn.

\* Divê organên ku bi tenê bi kirmanckî weşanê dikin bîn zêdekirin.

\* Divê zîman nebe alavek ji bo xizmeta siyaseta lê divê siyaseta bikeve xizmeta zimên.

\* Divê zîmanê organên medyaya Kurdî nêzikî hev bibe.

\* Divê gengeşiyên li ser medyaya Kurdî êdî ne bi tenê li ser zîmanê Kurdî werin kirin, lazim e li ser hemû beşên nûçeyan xebatên tematîk jî werin kirin.

\* Divê komxebateke taybet û bi tenê li ser medyaya Kurdî bê pêkanîn.

### **Maseya Saziyên Jinan**

\* Pirsgirêka herî mezin pergala perwerdehiyê ya yekzimanî ye. Di temenekî biçûk de zarok diçin baxçeyên zarokan û dibistanan ev yek jî dike ku zû werin bişaftin.

\* Divê Kurdî bibe zîmanê jiyana rojane û her malek bibe dibistanek.

\* Bişaftin û xwebişaftin tunekirina çand û zîman e û berovajîkirina dîrokê ye. Divê her kes ji xwe bipirse “Ez xwe çi qas nas dikim?”

\* Jinên li ser vê meseleyê bişaftinê wek cureyekî tundiyê dibînin.

\* Divê siyaseta her civakê bi zîmanê wê civakê bê kirin.

\* Di pêşxistin û parastina zimên de jin wek xwediyê roleke sereke tînin pê-nasekirin lê parastin û bipêşxistina zîman û çandê ne tenê berpirsiyariya jinan e. Lewra ev berpirsiyariyêke civakî ye. Ev hişmendiya zayendperest tundiya li ser jinan a veşartî diparêze.

\* Divê gotin an peyvên zayendperest ên di zimên de bîn sererastkirin. Divê hemû zimannas, nivîskar, mamoste, rojnameger, rewşenbîr û hunermend di vê mijarê de baldar bin. Lewra di bin navê parastina kevneşopiya çandî de gelek peyvên ku têra xwe zayendperest in ji hêla van kesan ve tînin bikaranîn.

\* Divê hemû sazî di bin sîwana xwe de perwerdehiya bi Kurdî bidin.

\* Divê bi hemû sazî û dezgehên esnafan re bê axaftin da ku zîmanê xwe yê dan û standinê bikin Kurdî.

\* Ji bo ku elîtbûna di navbera qadên çandî û civakî de bê tunekirin, divê çalakiyên hunerî dakevin qadan, nav civakê.

\* Bernameyên jin û zarokan divê di amûrên ragihandinê de bîn zêdekirin. Divê hinek fîlm û rêzefilmên Kurdî yê li gor civaka Kurd werin çêkirin.

\* Divê zîmanê hemû xebatên jinan ên wek xebatên 8ê Adarê û 25ê Ser-

mawezê û hwd Kurdî be. Divê temaya diruşma çalakîyên di van rojan de tundiya li ser zîmanê Kurdî be.

\* Divê ev pêkhatiya di civînê de amade be ku bibe şopdara biryarên ku derbarê bipêşxistina zimên de hatine dayîn.

\* Divê her sazî perwerdehî û bikaranîna zimên di bernameyên xwe de bi cih bike.

\* Weşangerî û çapemeniya Kurdî divê di warê zayendperestiyê de hesas bin, li pirçandîtî û pirolîtîyê baldar bin.

### **Maseya Saziyên Zarokan**

\* Li hinek sazîyên ku xebatên li ser zarokan dikin, zîmanê kargehan Tirkî ye.

\* Li gorî lêkolîn û xebatan dema ku xebat bi Kurdî werin kirin, zarok bêhtir rehet û bi xwe bawer in.

\* Di warê xebatên zarokan de heger mirov bi awayekî rast û zanistî nêzî zarokan nebe, tu encam nayê girtin.

\* Li gorî çavdêriyên sazîyên zarokan, pirsgrêka sereke nedîtina perwerdehiya bi zîmanê dayîkê ye.

\* Di tesbîtan de hat famkirin ku hin malbat bi xwe li ser zîman û çandê nasekin. Mînak di hêla zîman û çandê de tiştên ku dê û bav nakin ji zarokên xwe dixwazin. Dê û bav bi hev re Tirkî diaxivin lê ji sazîyan daxwaz dikin ku zarokên wan bi Kurdî biaxivin û perwerde bibin.

\* Di polîtîka û hişmendiya zîman de sazîyên kar û barê zarokan dikin lawaz mane.

\* Têkiliya di navbera sazîyan de ji ber ku lawaz e dan û standina sazîyana bi hev re baş pêk nayê.

\* Ji bo fêrbûna zîman û çanda xwe divê di nav sazîyan de bi taybetî di sazîyên zarokan de hevsengî û dîsîplîneke zanistî hebe. Wek mînak çand, zîman, huner û hwd divê di yek lîteretorê de were dayîn.

\* Ji bo bersivên derbarê perwerdehiya zîmanê dayîkê de divê hewldanên polîtîkayên perwerdehiya bi zîmanê dayîkê were afirandin.

\* Li gorî tesbîtan ji hêla çand û zîman ve rewşa zarokan gelekî ne baş e. Wek mînak dema ku ji zarokan tê pirsîn “Tu li kîjan televîzyonê temaşe dikî, kîjan pirtûkê dixwînî, bi kîjan zîmanî diaxivî?” bi gelemperî mînakên bi Tirkî didin.

\* Li gorî hin lêkolînan, bajarên ku şer lê çêbûne ji hêla zîman û çandê ve rewşa zarokan her ku diçe xerabtir dibe. Bi gotîneke din zarok ji çand û zîmanê xwe dûr dikevin. Ev jî hêza xwe ji polîtîkayên dewletê yê bişaftinê digire. Li van bajarên axaftina bi zîmanê Kurdî di nava zarokan de daketiye sedî pêncî.

\* Mamosteyên ku di atolyeyên zarokan de dixebitin baş bi Kurdî nizanin. Ji ber vê yekê bandoreke mezin a neyînî li ser zarokan çêdibe.

\* Ji ber serdestiya zimanê Tirkî, zarokên ku bi Kurdî dizanin hem li malê hem li derve ditengjiyên û di diyalogan de zehmetiyan dikişînin.

\* Li gorî maseya temaya saziyên zarokan, axaftina bi zimanê dayikê ji 13 saziyan di 7 saziyan de ji sedî sed bi zimanê dayikê xebat tên kirin. Saziyên din jî ji sedî 50 di xebatên xwe de zimanê dayikê bi kar tînin.

\* Hin saziyên zarokan ên ku xebatên wan ne bi Kurdî ne, bi ziman û çandê din perwerdehiyê didin. Ev jî dibe sedema bişaftina zarokan.

\* Bila ev pêkhate bi yek mijarê bicive û derbarê Zarok TVyê de bi giştî nirxandin û pêşniyazan bike.

\* Divê civak ji hêla çand û ziman ve were agahdarkirin û gel bi taybetî jî zarok teşwîqî saziyên ziman û çandê werin kirin.

\* Ji bo têkiliyên navxweyî yên saziyên zarokan lijneyek were avakirin û ew lijnê ji her hêlê ve saziyan bişopîne û piştgiriya hev bikin.

\* Ji bo xebatên hevbeş ên zarokan lijneya materyalan were avakirin û ew lijnê xebatên gerdûnî yên zanistî vekole û materyalan amade bike.

\* Kesên ku di sazî û dezgehên zarokan de dixebitin divê perwerdehiya ziman, hişmendî, çand û pedagojiyê bibinin.

\* Ji bo kar û xebatên zarokan kovar û ferhenga zarokan were amadekirin.

\* Ji bo xebatên zarokan ên bi Kurdî tora medyayê were avakirin.

\* Her saziyên ku xebatên zarokan dikin di nava xwe de meclîsa zarokan ava bikin.

\* Ji bo ku zarokên Kurdan bikarin perwerdehiyê bibînin, divê li gelek deveran baxçeyê zarokan ên bi zimanê dayikê werin vekirin.

## **Tora Ziman û Çanda Kurdî**

Di dawiya komcivînê de pêdiviya bi toreke berfireh a ji bo ziman û çanda Kurdî hat pesendkirin, bi navê Tora Ziman û Çanda Kurdî toreke hat avakirin û û prensîbên wê, qadên wê yên xebatê, armanc û peywirên wê û lijneyên wê hatin zelalkirin û eşkerekirin.

Netewesaziya ku li ser yekperestiyê ava bûye ji bilî ziman û çanda serdest, ji çand û zimanên din re mafê jiyanê nahêle. Qonaxa dawîn a polîtîkayên bişaftinê di hişmendiya civaka Kurd a parastin, geşkirina ziman û çanda Kurdî de qelsiyek pêk aniye. Bi vê polîtîkaya yekperest, desthilatdar dixwazin ras-

teqîniya welat û miletan bi rêya bişaftina çand û zimanan ji holê rakin. Li hemberî vê plansaziya bişaftinê, divê Tor plansaziyeke giştî ya parastin û geşkirina ziman û çanda Kurdî çêbike. Ji bo vê yeke jî pêwîstî bi amadekirina nexşerê û stratejiyeke zimanî, çandî û meşandina xebateke hevpar heye.

## **Meclîsa Giştî û Sekreteryaya Torê**

Piştî du rojên bi tesbîtên xurt û teqez ên têr û tijî, ji bo jiholêrakirina van êş, kêşe û arîşeyan; ji bo sepandina rê û rêbazên çareseriyê yên ku hatine diyarkirin; ji bo xwegihandina bi armancên bingehîn ên pêkanîna Torê ji nav civînê 27 kes wek Meclîsa Giştî ya Tora Ziman û Çanda Kurdî hatin hilbijartin. Paşê di heman rojê de ev kes li hev civiyan û sekerteryayeke ku ji 5 kesan pêk tê hilbijartin. Vê sekerteryayê bi daxuyaniyekê ji raya giştî re pêkhatin û pêkhatiyên Torê ragihandin û bi biryara amadekarina rêbaznameyeke xebata navxweyî û karnameyeke salane dest bi karê xwe kirin.





Web: [www.torakurdi.org](http://www.torakurdi.org)  
E-mail: [info@torakurdi.org](mailto:info@torakurdi.org)